

ARMANC
Xwedî: Yekîtiya
Karkerê
Demokratên
Kurdistanê
★
Ji mehê carekê
dertê
Hejmar 72
Gulan 1987
Buha: 10 Skr.
2,5 DM

Armanc


SERXWEBÜN • DEMOKRASİ • SOSYALİZM

Adress : Nordenflychtvägen 20, 112 51, Stockholm, Tel: 08 - 52 87 56 □ Adresa têkilî û naman : P.O. BOX 240 12, 750 24 Uppsala / SWEDEN □ Postgiro : 50 37 99 - 9 □ ISSN 0348-7388

ARMANC
Issue by
The Democratic
Union of
Kurdish Workers
★
Monthly Kurdish
Magazine
Nr. : 72
Maj 1987
Price: 10 SK.
2,5 DM

KURDISTANA IRAQÊ :

Ji alîkî de bombê Kîmyayî Ji alîkî de sîrgûna mecbûrî



* Li Silêmaniyê û Hewlêrê, rejîma Seddam bombê kîmyayî bi kar anî, 33 kes hatin kuştin, 300 kes birîndan bûn.

* Li Dihok, Mûsil û navçen dora wan 240 gundên Kurdan bi zorê hatin valakirin û sîrgûnkirin.

Di van her du-sê mehêne dawî de, rejiema diktatoriya BAAS'a Ira- qî êrîşen ser Kurdistana Iraqê ser

gund û bajarêne Kurdistanê, ser erden rizgarkirî yên Kurdistanê dijwartin kir. Èdi tank û top û balafrîn şer têrê nakin, rejim bi hovîtiya xwe bombê kîmyayî di nav xelkê sivil ê Kurd de bikar tîne.

Li gor beyana CUD'ê û ya Partî Demokratî Kurdistan-Iraq, hukumeta Iraqê roja 15'ê Adarê li Silêmaniyê û Hewlêrê bombê kîmyayî li dijî gel bi kar anî, 33 kes hatin kuştin, 300 kes ji birîndar bûn. Navên gundên ku çekên kîmyayî dijî wan hatine bi karanîn ev in:

1- Yaxemîr, 2- Helden, 3- Bir- gilo, 4- Sergilo, 5- Calawe, 6- Cinarnî, 7- Nolicge, 8- Awezî 9- Sirwan 10- Kanîtû.

Bombê kîmyayî li dijî van gun- *Dûmahîk r.7*

Ku şivanê pez gur be

Buyerên van her çend mehêne dawî yên ku li Tirkîyê û Kur- distanê rû dan, pîlek wisa rakirin ku bivê nevê perda sansura hişka dîktatoriya faşîst ji hêlêkê de çîrand û munaqêsa ser mesela Kurd derxist rûpelên kovar û rojnamen Tirkîyê. Di vê munaqêse de helbet berpirsyarên dîktatoriyyê, burokrat û rojnamevan û nivîskarên hevalbendên wan li tûtûka xwe ya berê xistin; qerepera "cudaxwazî, tiliya derva ya hêz û dewletên dijmin ên dewleta Tirk" li dar xistin.

Ji alî din ve, her çîqas gelek kêm bin, hejmara wan bi tili- yê destekî bêne hejmartin jî hin nivîskar û rojnamevanên demokrat bi tirs û qelsî û zêfî be ji qelema xwe danîn ser birînê û dan xwiyakirin ku li Tirkîyê problemek heye divê berî her tişîf navê wê yên esasî lê bê kirin: ev ji "problema Kurd" e. Kesên wiha di rewşa îroyîn de, hin jê naxwazin di mesela dayina mafêni milî yên Kurdistan de gavêni pêş bavêjin, hin jê ji dilxwazin lê ji ber qanûnên teror ceza û sansura dîktatoriyyê rî li ber xwe nabînin. Loma ji munaqêsa "problema Kur- dî" ku van çend mehêne dawî rû da, di çarçewa qebûlkirina hebûna Kurdistan de ma û (hin iştîsna ne têde) hat gotin ku Tirkîyê divê serî xwe ji qûmî derxe, hebûna Kurdistan qebûl bike û li gor vê hebûnê riyek helkirinê bide ber xwe.

Bes navandina "navê Kurdistan" û daxwaza qebûlkirina hebûna Kurdistan bi tenê ji Tirkîyê seranser hejand. Mehke- mîn dîktatoriyyê gava dîtin hin kovar "karêni ji serî xwe mestir dîkin" yan "zimanê xwe zêde dirêj dîkin" bi yekcarî rî li ber wan girtin, ew hejmaren wan kovaran civandin û dawe di derheja rojnamevanon de vekirin.

Bi vê pîle re tiştekî din ji diyar bû; ku perda bi navê demokratîya ya ser ruyê sosyal demokrat û demokratên burjuwazî yên Tirk bi carekê de hat xwarê û ruyê wanî reşî şovenîst der- ket meydânê:

Demirel, gazind ji hukumeta dîktatoriyyê kir ku çîma "xxwîn li erdê maye". Ecwît bi durûfî beyan da ku hebûna Kurdistan bê qebûlkirin û mafêni eqaliyef ji wan re bê dayîn wê mafê wan ji ūrî kêmîtir be". Ugur Mumcu; nivîskarê rojnameva Cumhuriyetê ku xwe sosyalist dihesibîne, ji dîktatoriyyê daxwaz kir ku çîma şerê Kontr-gerîlla li hemberî "cudaxwazan" nayê bikaranîn. Partiya Sosyal Demokrat a Erdal Înonu, endamê

Dûmahîk r.6

VIYANA:

Konferans li ser "Polîtîka Tirkîyê ya Netewan" Juriya Navnetewî Tirkîyê rûres kir

Li Viyana di 9-11 Gulanê de konferansek navnetewî li ser siya- seta Tirkîyê çebû. Endamên juri- ya konferansê Michalis Karalam- bidîs, Prof. Theodor Veîter Feld- hîrsch, Prof. Alain Fenet Meriel, Benjamin Whitaker û Tilman Zulch bûn. Pisporê problema Kurdî, Ermenî, Suryanî, Qibrîs, Çerkez, Laz û Yunanan teblîx dan Konferansê.

Di navbera 9-11'ê Gulana 1987'a de li paytexta Austurya, Viyanayê konferansek li ser "Polîtîka Komara Tirkîyê ya Netewan" pêkhat.

Di Konferansê de pisporê rewsû û mesela Kurdish û ya Kurden Ezi- dî, pisporê Ermnîyan, yê Suryani- yan, yê Qibrîs, yê Çerkez, Laz û Yunana peyivîn, bi dûr û dirêjî li ser politika Tirkan a li hember wan

sekinîn, neheqî û zilma li ser wan yeko yeko anîn holê. Li ser navê gelê Kurd O. Tûkû besdarî kon- feransê bû û peyivî. Endamek Komita Konferansa Helsinki bi O. Tûkû re civînek çekir, radyoya Avusturyayê ji bi O. Tûkû re hev- peyvîn kir û weşand.

Piştî ki pisporê netewe û eqa- liyetan teblîxen xwe dan, juriyek *Dûmahîk r.7*

WAN:

Kevneperekstan xorkeki şoreşger şehîd kirin



Bistik ji dema rakirina cenazê M. Şîrin-Wan

Roja 4'ê meha Gulanê xorkeki Kurd ê şoreşger û welatparêz M. Şîrin Tekîn li bajarê Wanê ji aliye grubek kevneperekst hat şehîdkirin û pênc kes ji hatin birîndarkirin. Ev mesela han ji wek hemû qewi- mandînê Kurdistanê ji aliye kesen neyar gelên me û ji aliye weşanên

sermiyandaran ve hat xwestin ku bi ber hin aliyan de bê kişandin û wek dijîtiya navbera du bajaran bê nîşandan. Xortê hate şehîd kirin ji bajarê Diyarbekirê ji qeza Bis- milê ji gundê Tepê bû. Xorteki şoreşger û dilxwazê PPKK'ê bû. Baweriya wî bi xelasîya netewa wi


ya Kurd hebû. Di vê riyê di li gora gewet û zanîna xwe xebatek ji dimeşand.

M. Şîrin Tekîn, ji bo berdewa- ma xwendina xwe ya bilind li bajar- ê Wanê di unîversitê (100. Yil Unîversitesi) de dixwend. Wek *Dûmahîk r.6*

Gerd Walter li dijî serlêdana Endamîtya Tirkîyê ya ji bo Yekîtiya Ewrûpa a Ekono- mîk derket: DIVÊ GELÊ KURD BIGIHÎJE MAFÊN XWE

Parlementerê SPD (Partiya Sosyal Demokrat a Almanya Federal) yê Parlementoya Ewrûpa Gert Walter dîtina xwe di derheqê serlêdana Tirkîyê de. ku dixwaze bive endamê Yekîtiya Ewrûpa ya Ekonomik (YAE), ji piresê re eşkere


divê ew ne be endamê Yekîtiya Ewrûpa ya Ekonomik.



Gerd Walter

BANGA CELAL
TALABANÎ

Ji zaroyê netewayê Kurd ê li cihanê re !



Ey keç û lawên netewayê Kurdê serbilind ên derveyî welêt ! Ey xwiş û birayê Kurd ên li Kurdistanê !

Ey kurên gelê Kurd ên bi şeref, li Iraq, Iran, Suriyê, Tirkîyê, Yekîtiya Sowyetan, Efganîstan, Pakîstan, Libnan û Urdun !

Bi silavên xwe ên biratî dixwazim we serwext bikim; Xwîn- rîjê hov Saddam hisen ji bojbîkaribe ramiyara kolonyalîzma dagir- ker pêkbîne, gel û gundiyyen Kurd ên aşitîxwaz ji welatê wan derxîne û Kurdish bike Ereb, li Kurdistana Başûr bi çavşorî êrîşî gelê me dike. Cih û waran dişewitine, gundan wêran dike, li pêşberî gelê me yê serbilind kiryarê nemirovî pêktîne û iro ji dest bikaranîna çekên kîmyayî kiriye. Her wuha Saddam Hisenê xwînîrê ê faşîst li pêşberî hemî xelkîn Kurdistana Başûr, Kurd, Tirkmen, Misilman, Mesihî û Ezidî ceng û êrîşa xwe berdewam dike.

Dûmahîk r.6

Neheqiya bi talde û destana "Siyabend û Xecê,"

Gava neteweyek dikeve bin destê neteweyeki din, hemû tiş-tîn netewê bindest li ber lingên zordarén netewê serdest diçin. Di ví warî de barekî gîran û sisteme ke nemirovanî bûye para gelê Kurd. Ziman jê hatiyê birin, hati(1) ji netewê serdest re maye, çand û folklor hatine û têne binaxkirin, dirok hatiye berfâvajîkirin, welat hatiye parvekirin û namûs û mal hatine û têne talan kirin. Be guman armanc jê ew e ku xêrûbê-reñ welatê Kurda, Kurdistanê bidoşin û bikurritin.

Helbet, li hember vê sitemkariyê, berxwedana gelê Kurd jî ne niçmîriye(2). Li dijî herdu aliyeñ çewsandinê -çinayeti û netewî-berxwedan geş e û roj bi roj gumreh dibe.(3) Rast e, iro em wek ku tê xwestin li folklorê xwedî der-neketine. Ev yeka hanê ji pir sedeman hatiye. Wekî dinê, ez bawer im ku lawen gel ên mandê dê vî karî baş bibin serî.

Tu guman li ser nîne ku, destana "Siyabend û Xecê" ne a Kurdi be. Di Kurdishanê de destana "Siyabend û Xecê", destaneke navser e.(4) Bi navê "Destana Siyabend û Xecê" du pirtûk ketîne destenê min. Yek a E. Ebû Zira'ef(*) û a din a Hiwanîs Şiraz e.(**) Bi rastî herdu pirtûk jî dile mirov tîr dikin. Di vê gotarê de ez dixwazim wan herdu pirtûkan berhevî destana folklorî bikim. Min destana folklorî, sala 1985 an ji devê Ehmedê Nêşir, ji gundê Şadîrê, Çiyayê Kurmenc girt. Teve(5) berhevkinî, ez dixwazim li gora nîrîna xwe, rexne û têbîniyîn xwe, yê li ser wan herdu pirtûkan diyar bikim.

E. Ebû Zira' -gotinê naxwazi-xwestiye di saysa gelek nav, derew û tiştan de mijadperestiya Erebê zordar bîpeçine û avsûnekê(6) çêke, ji xwe re bi talde ke(7) û xwe pê vesêre. Mîrik wek ku mejiyê wî xwestiye bi destanê listiye û nivisandiye. H. Şiraz ji wek dile wî xwestiye destan nivisandiye. Herduyan ji pîroziya guhertina destana folklorî di pişt guhêñ xwe re avêtine.

Eger mirov bi rastî bala xwe hûr bide pirtûka ku E. Ebû Zira' nivisi, mirov wî di pir ciyan de digre.

Mirov hest dike, pêna(8) ku wî ev pirtûk nivisandi qey nû ji diya xwe bûbû û her bûyereke bi nav, bi sinor û bi dirok te ji ber kirine. Di pêşgotina pirtûka wî de ev xwes diyar e. Di wir de bi xwe distrê û ew bi xwe jî "tew" dikê.(9) Ji serê destanê heta ku meriv digihêje bin destanê E. Ebû Zira', di tala xwe re bûyerên wê dirêj kirine, pan kirine, fireh kirine, vezelâdine, şor têde pir kirine û li hev anîne. Heta ku ji wî hatiye, gema-ra mejiyê xwe xistiyê, bê ku rûmetâ destana folklorî bigre. Min divê, ez bi kurtî têbîni û rexneyen xwe, ên serekî ku min ji pirtûka wi derxistine, diyar bikim:

1- Ka çacikêñ(10) van gotinê wî yêjérîn?

a)- "Ev bû ku 600 sal ev destan di devê çirokbêjan de dijî"(rûpel-6).

b)- "Kurd dibinîn, ev destan a vê heyamî ye. (1100-1500 Z.)"(rûpel-8)

c)- "Ev destan digihê dawiya dewleta Ebbasî." (rûpel-8)

d)- "Ev destan hemdemâ talanî Teter û Mongolan li ser gele Ereb e. (1232.Z.) (rûpel-8)

2- Ji devê kê ev destan girtiye? Ji kû ye? Li kû rûdine? Wî zinhar(11) hewil nedaye. Bi tenê gotiye: "Ev destana ha wê bi navê min-ne bi ê kesekî din-were nişan kirin." E. Ebû Zira' yê bextîspî çawa ev destana ha bîhistiye? Çawa zanibû? Bê çavik gelo çedîbe?

3- Piştevaniya êline Ereb ji Kurda re, li dijî Osmaniyan û destigirtina wan di ser serê Kurda re ji layekî de û biratiya misilmanî jî laye din de, gelo ne avsûn be ku ew pê zordesiya Erebê nîjadperest dipeçine? Wî daye xuyanîkîrin ku ne ji Ereban bûya, wê Siltan Hemidê Tirk talana Kurda biriba. Di destana folklorî de, navê Ereb di ví warî de kok nîne.(12) (rûpel 89-112).

4- E. Ebû Zira', di pirtûka xwe de serê destanê û binê destanê ji fel-sefa misilmantîye, ji gotinê Quranî û dengkiranê Pêxember û h.w.d. dagirtiye. Ew hemû ji ber xwe derxistine û bi destanê ve qemitandise ku pê mejiyê xwe yê olperest û kevneperest têr av bide.

Ya folklorî ne bi wî rengî ye.

5- Pesindaneke ji ber xwe; yekî bêtir mîtafiziki; daye qederê. Di rûpelên 106-107 an de dinivise: "Karê min -Qeder dibêjê Siyabend- bi awakî gişane ye, hêşantir e ji ê tekane. Di gunch-kariyê gişane de, ez mîleteki an neteweyekî li dijî yekî dinê dihêvojim, ta ku yek ê din qirr bike û li vê derê ez bi xwe jî lê sér dikim." Di cenga Sedam-Xumêni de gelên Îran û İraqê gunehkar in, heta ku ji herdu serîyan bi hezar mirov dimir? Şeniyê(13) Hîroşîma û Nagasakî gunehkar bûn, heta ku Emrikyen emperyalist bi bomba atomî ew şewitandin? Bi vê yeka han, E. Ebû Zira' dixwaze berjewendiyen çinayeti bincil bice.

6- Qeder, di destana folklorî de cara yekî derdide(14) û cara dawiyê vedixwe.(15) Qeder, di pirtûka E. Ebû Zira' de, bi carekê dernade û tu hêz jê xurtir û gewretir nînin. Li vê derê wî, destan li gora bîr û baweriyeñ xwe yê misilmânî yê hişk guhartiye. Olperestiya wî ya bi koratî nehîtiye ku ji rûmetaqederê dakeve.

7- Di pirtûka wî de, nîgar-kişandina qederê, bê bend û rade ye. Heta ku wî kariye, qeder bilindir kariye, xurtir kariye, zanta kariye û h.w.d. Di rûpela 109 an de qeder dibêjê Siyabend: "Kekê Siyamed, xem nake. Ez bûme birayê te. Ci xem digihêje te, digihîje min jî. Ci ta şâ bike, min jî şâ dike... Tikaye, tu ji ber min tişteki nevesêri... Deng ke kekê Siyamed!..." Meğer qeder her tişt e. Çito ne aghdar et ku Siyamed sitembar e? Ev ci dijî yeti?

8- E. Ebû Zira' pirtûka xwe bi navê "Destaneke Efsanî" nişan kariye. Diyar e E. Ebû Zira' li bêka(16) HOMER bi nîrîne şâ dije. Di heyama Homer de zanîn ne wekî niha pêşketî bû. Tevî wê, dîsa Homer dabû xuyanîkîrin ku wî destanê xwe (Ilyad-Anyad) ji devê gel girtine, ji cem xwe neafîrandine. Ev ci nakokî ye? E. Ebû Zira' ne gotiye ku destan ji kê standiye û navê pirtûkê daniye "Destaneke Efsanî" û li ser xwe binavî kiriye, di gel mîrxasiyeke helbest-

vani. torevanî, pexşane û afirandin di pirtûka xwe de çekirine. Gelo ev dikeve seriya? Destan bi xwe neynika rewş, ponij û jîna gelâ ye. Nabe kesek di tala xwe re biguhûre, pê bilize û xwe bike xwendiyê wan.

9- Evqas navê kesen destanê, dirok û ciyên bûyeren wê, giş ji ku anîne?

a) Xecê, 3 sala ji Siyamend biçuktir e.(rûpel 53). b) Siyamend 3 sala ji élê bi dûr ket.(rûp.60). c) Nîvî didiwan ji meha avdarê(rûp.11). d) Siyamend û peyaen wî çûne Nisêbînê(rûp.101). e) Estane (İstanbul) 29 Nisan 1070(rûp.112). f) Salih axa, Mihi-din axa, Nûra, Narê, Rihan, Hemid, Mele Cima', İbrahim, Peşnimê Şehab, Ebdilrezaq axa, Siltan Reşad, Siltan Hemid, Mele Ebdilselam, Mîr Me'n, Mîr Vesab, Sidqî axa û h.w.d. Evqas nav, cî û dirok de destana folklorî de dernekin. Bi taybetî dirok kok di destanê de nîne.

Karê Hiwaniz Şiraz ji ne kêmî e din e. Wî jî navê pirtûka xwe daniye "Çiroka Evinî, Şanûgeriya Siyamoto û Xecezârê." Mirov vê pirtûkê bixwîne, kok bîna şanogeriyê têde nîne. Wî jî di tala xwe re, bi rengî wî xwestiye, destê xwe direjî destana "Siyabend û Xecê" kiriye. Va ez li jîr rexne û têbîniyîn xwe yê derbareyî pirtûka wî de jî diyar dikim:

1- H. Şiraz, Siyabend kiriye sivanekî Ermenî û Xecê kiriye qîza Kurdeki axa. Di destana folklorî de Siyabend kurê rîncberkî Kurd e, ne Ermenî ye.

2- Çirokên destana folklorî, dûrî yê h. Şiraz in. Wî destan ji binî de guhartiye û bi rengeke teze û nûjen nivisandiye; ango, li bêka ekolên vê sedsalê çûye. Gelo éko-lîniha li ku ne û destan li ku ye?

3- Niviskarê me, doza gavekê kiriye û hin dema wê gavê nehatiye. Ev ji aliyeke de. Ji aliye din de dûrîlîti û koçbarkirina Ermenîyan -wek di pirtûka wî de bi rengeke baş xuyaye- ji Kurda zaniye: "...bavê Xecê, Kurdê axa, Siyamed, sivanekî Ermenî diqewtîne û dibêjê: 'Çiyayê Sîpanê ne û te ye, ne ji peravê behra Wanê...' Siya-

AMED

Gotinek pêsiya heye, dibêjê; "rev nîvî mîraniyê ye". Ez bi xwe vê gotinê, vê şîret rast nabînim; ev yet. Ü ya din jî, ez dibêjim ev gotin ji ali hin pêsiyên me yê "tîrsonek" ve hatiye gotin; ya ji hinekîn tirsonek li ser navê wan gotin e. Ev gotin pêsiyên me, ya ji hinekan li ser navê wan gotibe, bi baweriya min ev pirr ne muhîm e; a muhîm bi vê gotinê çi şîret li me hatiye kirin: "Çaxa we nikaribû bi yekî birevin; rev ji mîraniyekê û ji ber fedî nekin".

Sebebê ku ez "rev nîvî mîraniyê" nabînim yet jî eve: dema meriv di ser de ji ber yekî bireve, kes nabêjê; "Bijî, welle camêr nîvîmîraniyê kir..." Tiştekî din, rev bi xwe jî, hertim meriv xelas nake. Ü ku meriv carê fêri revê bû, merivî heta dawîya jiyanâ xwe her bireve û hinekîn ku berra merivan de wê tim hebin... *

Meriv jî belayê re bêje wê de, na çaxa ber bi meriv hat, merivê bêje ber Mihemed silawat...

Di jiyanâ meriv de hin bûyeren wisa hene ku meriv qet nikare ji bîr bike. Ev bûyeren ku ezê li jîr qal bikim jî, ji van bûyeren yet e...

Çaxa ez 9-10 salî bûm lawikeki di tala min re rika xwe li min girêdabû. Ez li ku bidîta ma, wê bîhata riya min bibiriya; di bêrîkîn min de ciyê min heba wê bi zor ji min bistenda. İcar a xerab, bi vê jî ne dihat ser, di ser de ji neheqî li min dikir; li min dixist. Hema min serê xwe ji hewşê derxista biçuyama nav hevalan, "Gurê min" (Min di dile xwe de nav lê kiribû "Guro"). Lî bi rastî ji her kesî re ne gur bû, bes "Gurê min" bû) her li wir hazir û nazir bû. Ji ber ku em her du ji zarokên mehelekê (taxekê) bûn, te bixwesta ne xwesta karwanê me li hev diqelbî...

Min çuqa hivza xwe jê dikir, dera ew lê ba min xwe jê dûr digirt; lê cardin ji çare û mukûn tunebû, wi yê muheqeq sebek bîbîkîn bidya û bîhata bela xwe di min bida. Edî bûbû çavbîrrin, kîngâ dilê wî bixwesta wê bîhata destê xwe têkîra berikîn mina kab, gulle, bişkok ci tê heba wê bi kîfa dile xwe ji xwe re bin-qanda û bibîra. Di ser de ji wê him barek xebêrê xwe ji min re bida û him ji du-sê pihîn bavête ji min de... Ü min jî hertim bikira kûzî-kûz û bigota xîrp û ji ber bazda. Wî yê jî, wek tajîyê berra ser pişta xezalâ da, heta ber devê derî berra ser pişta min da. Ez wê rojê xelas dibûm, lê roja din mehel û kuçe cardin ew kuçe bû; ez û "Guro" emî hev rastî hev bîhata...

Vê yekê demek dûr û direjî ajot. Min dest bi kar kir. Rojekê selika (sepetâ) mala hostê min di dest min de ez diherim mala hostê xwe. Tam li ber deriyê mala hostê min, (Ev mehel, mehelek din bû, min qet bîr nedîbir ku Guro wê li vê mehelê jî di min ve derkeve û cardin bela xwe di min bide) bi gewriya min girt, got:

-Ev ciye di selikê de?

Min got "Fêkî ye..."

Got: "Ka bide min..."

Min got "Ez nadim!". Wî got, "Tuyê bidî..." "Ez nadim", "Tu yê bidî".

Ez mecbûr mam, min selik danî... Em hatin hev; wî berê dawşand min... Me xwe ciyîn hev kir; ez ketim ser. Edî serîyo kurro te ci daye... Min ji alîki de lê dixist û ji alîki de jî dev lê dikir û digot; "Bîbêjê toobe..., toobe..." zare zara wî mehel li me anî hev, pîreka hostê min bi zorê ez ji ser rakir!

Dûre em bûn "hevalen" hev..., edî hew bela xwe di min da. Wê çaxê min fahm kir, ku desthilan fereca xêrê ye.

Ji wê ruyê û vir da ye ez gotina, "rev nîvî mîraniyê ye" rast nabînim; di delî vê gotinê de dibêjim, "tîrsî û rev ne karê mîrâ" ye. Ya ji wek pêsiyên me yê, "mîr" gotine; dibêjim, "pêyî tirsonek tu carî nikare bi sîng û berê sîpî şâ be".

ka wê ket, ji ber ku ji dûr de gule lekîketibû Dilvin nemir. Gule di hesiyê pista wê da sekînî, doktoran nikaribûn gule ji laşê wê derxin, Dilvin hêjî di nexwesxanâ de ye û gule di pişte da ye. Ji xeyn Dilvin zarokeki 6-7 salî yê din jî li gorâku gel dibî hatiye birindarkirin û ji ber ku birfîna wî xedartî bûye malbalta wi, ew bîriye Şamê. Ew ji di eyîn rojê de hatiye birindarkirin, li taxa Qudûrbeg nêzîki Cembelê, diktatoriya faşist bi vi awayî di Newroza 1987'a da ne tenê li Kurdistana Turkiyê li Kurdistana Sûriyê ji dîsa xwîn rijand û barbarî û hovîtiya xwe carek din nîşanî cihanê da.

Bi ser hemû tehdîd û erîşen diktatoriya faşist ji Newroza wek tevâyiya Kurdistanê, li Qamîşlo ji bi girseyî hat pîrozkin. Serî sîba Newrozê bi hezaran Kurd ji bo pîrozkinâ Newrozê, ên bi peyati, ên bi traktor û qamyona û ên bi pişqab û texsiya rîya ciyê ku ewê Newroz lê bê pîrozkin, kîleka balefirgeha Qamîşlo girtin. Jin û qîz bi cilêngareng xwe xemîlandibûn. Kort û mîrban bi cilêngareng xwe yê heri nû ve hatibûn Newrozê. Gelê Kurd bi kal û pîra, mîr û jînan, xort û qîzan, zarok û piçikîn pêşkê ve hatibûn Newrozê. Bi tembûr û def û zirne, bi

sitrân û muzikên gelêri, welatperweri û folklori ve, bi govend û dilanen giran Newroz hat pîrozkin.

Ji aliye din da Partiyan Hev-Bendi û Kurdistanâ Sûriyê û her sê aliyeñ Partiya Komînist bi hev re ji bo pîrozkinâ Newroz tîfaq çekirin. Di ciyê ku Newroz lê hat pîrozkinâ (Partiya Hevgirtina Gel a Kurden Sûriyê, Partiya Demokrat a Kurden Sûriyê (El-Partî), Partiya Çep a Kurden Sûriyê) û her sê aliyeñ Partiya Komînist a Sûriyê bi hev re komikên xwe yê folklorî û muzikî derxistin ser ciyê şanogeriyê, her komikek bi cilêngareng xwe yê netewî, folklor û muzikî netewî û welatperweri û şoreşgirî pêşkêsi gel kirin. Gelek bala gel kişandin û bi hazaran meriv hat temaşa wan û ji komika ra li çepika xistin. Bi vî hawî ji serê sîbê heyâku ro cü ava Newroza 1987'a li Qamîşlo bi şâhî û serifazî hat pîrozkin.

Newroza 1987'n carek din nîşan da ku ne kuştin ne girtin û ne ji tehdîd û erîşen hov nikarin Newroz bidin sekinandin. Gelê Kurd wê ji roja azadî û aştiyê, Newroz ra xwedî derî û wê bide jiyanandin. Gelê Kurden Sûriyê (El-Partî), Partiya Çep a Kurden Sûriyê û her sê aliyeñ Partiya Komînist a Sûriyê bi hev re komikên xwe yê folklorî û muzikî derxistin ser ciyê şanogeriyê, her komikek bi cilêngareng xwe yê netewî, folklor û muzikî netewî û welatperweri û şoreşgirî pêşkêsi gel kirin. Gelek bala gel kişandin û bi hazaran meriv hat temaşa wan û ji komika ra li çepika xistin. Bi vî hawî ji serê sîb



Dewletên Îskandînavya li ser muhaciriye konferansek pêk anîn

PETER NOBEL: "Raporên masmediyê yên li ser 'îsgala muhaciran', 'karbidestê bêçare' û 'qaçaxçiyê însana' dijitiya biyaniya zêde dike".

Komitâ Seredana Îskandînavya-yê rojê 22-24'ê Nisanê li Saltsjöbadenê konferansek pêk anî. Mijara vê konferansê "siyaseta penaberî û muhaciriye li Îskandînavyayê" bû. Di vê civinê de ji karbidestê welatên Îskandînavyayê, ji kesên siyasi û biyanî nêzî 100 kes besdar bûn.

Van salên dawî li welatên Îskandînavyayê muhacirî û penaberî dijwartir bûye. Nemaze Finlandiya deriyê xwe bi temamî girtiye. Li Swêdê, Norweçê û Danîmarkayê ji bo rawestandina muhacirî û penaberî anîzimên û ji ali demokrasiyê, ekonomî û mafê mirovatiyê pesnê welatên Îskandînavyayê da. Li gor Tore Toreng muhacirî û penaberî li welatên Îskandînavyayê dijitiya biyaniya afirandiye. Li gor lêkolîneke nû ku li Norweçê hatiye kîrin, piraniya Norweçiya kêmkirina muhacirî û penaberîyê dixwazin.

"Pisporêne me tune ne"

Karbidestê dewleta Kamboçayê berê xwe dane deriveyi welat û gazî welatiyê xwe yên xwenda dikan.

Wek tê zanîn dema Pol Pot kirdayeti xist destê xwe, dest-pêkir gundiyan anîn bajêr û berê kesên rewşenbîr dan gun-dan. Pol Pot bi vê ji nema, dest bi kuştina kesên rewşenbîr - wek doktor, awukat, muhen-dis, hemşire û h.w.d. kir. Ji ber vê yekê ji rewşenbîrên ku ji destê Pol Potê xwînmij fili-tibûn, berê xwe dabûn wela-tên din.

Ev çend sal in ku karbides-tê Kamboçayê giraniya xwe dane gîhandina rewşenbîr, teknikzan, pispor û h.w.d. Lî belê gîhandina kesên wiha demek dirê distîne. Dibistan û

unîversitênu ku ji rejîma Pol Pot zirar ditibûn tê tamîr kîrin. Helbet ev tişt wê demek dirê bistîne.

Dema Kamboçya ji destê Pol Pot hat xilaskirin (1979), tenê 20 doktor ji mirinê fili-tibûn. Ji bo gîhandina doktore-kî şes sal divê. Ew kesên ku sala 1980'ê dest bi xwendîna unîversitê kîrine hîn nû dest bi xebatê dikan.

Hukumeta Kamboçayê nuha berê xwe daye welatiyê xwe yên ji zordestiya Pol Pot reviyane çûne derveyî welat. Hukumet di gaziya xwe de wiha dibêje; "Em ji wan hezkîrina Partiya Komunist an ji sosyalizmê naxwazin. Daxwaza me tenê ew e ku welatê xwe hez bikin."

Li Yekîtiya Sovyetê jin



Çapxana İstatistikî ya Komitâ Merkezi li Moskovayê, bi navê "Jin li Yekîtiya Sovyetê" kitêbe-ke istatistikî hate çapkîrin.

Li gor vê kitêbê ji 1500 endamên Sovyeta Bilind a YKSS (Yekîtiya Komarên Sosyalist ên Sovyet) 492 kes jin in. Ji 2,2 milyon endamên Sovyetên herêmî %50 jin in.

%60 ji pisporênu ku ji Unîversite û zanîngehê bilind mezûn dibin jin in. Di kategoriya lêkolî-

nevanan de %40 jin in.

Ji xwendevanên unîversitê %55 jin in. Di besen ekonomî, huqûq, pedagoji û dermansazî de jimara jinan ji ya mîran zêdetir e. Kesên ku dê sala ku bê bibin muhendi-sen endustrî, inşaatê avayiyan û transportê piraniya wan mîr in.

Tenê %44 ji wan jin in. Jimara jinan ku wê bibin muhendis û pisporêni kîstûkal tenê %36 jin in. (APN)

NUFUSA DINÊ WÊ BIBE

11 MILYAR

Eger pêşî lê neyê girtin wê nufusa dinê di sala 2050'ê de du qat zêde bibe. Li gor inştitüyeke Amerîki wê nufusa dinê bibe 11 milyar.

Li gor inştitüye divê welatên pêşdeçûyi di navbera 1989-1998'an de 32 milyar dollar alîkarî bidin

peymanek çekiribûn. Li gor vê peymane, ji bo ku Swêd û Swîsre bikaribin Cûhiyan ji sinorê xwe derxin hukûmeta Nazîsît mohra "J" li pasaporten Cûhiyan dixist.

Peter Nobel di ahaftina xwe de salên 1980'yi bi sarbûnê navand. Li gor wî di van salan de kar û xebatêni ji bo însanî roj bi roj kalîta xwe winda dike û welatên Ewrûpa ji bo rawestandina muhacir û penaberan bi hev re ketine rekabetê.

Peter Nobel rexne anî ser roj-name, radyo û televîzyona Swêdê û wan bi afirandina dijitiya biyaniyan iham kir û got; "Raporên masmediyê yên li ser 'igala muhaciran', 'karbidestê bêçare' û 'qaçaxçiyê însana' dijitiya biyaniya zêde dikan".

HEFTA DOSTAYÎ LI SWÊD (18-24 Gulan 1987)



Li seranserê Swêd, di rojê navbera 18-24'ê Gulanê de heftak dos-taniya navbera civakên gelan tê amadekirin. Pirozbahîyê vê heftê li gelek bajêrén Swêd wê çêbi-bin û ji bal komelêni civakî, ji bo hevkîri û piştgiriya civakên li Swêd tê amadekirin.

Di seranserê Hefta Dostayî de, wê li bajêrén wek Strangnas, Uppsala, Orebro, Hagfors, Stockholm, Mora, Goteborg, Botkyr-

ka, Malmo, Tingsryd û Borlenga bi sedan programen kulturî; muzik, govendêni gelêri, ahengêne curbecur, konsert û xwarînên biyaniyan bêni pêşkêskirin. Armanc ji amadekirina vê heftê ew e ku naskirin û dostaniyek xurt di navbera grûbêni biyani û Swêdiyan de pêk bê, kultur û rewşa hev a civakî, problemen hev nas bikin. gel nêzikayiyê li hev bikin.



Di nav RRF'ê de hêviya yekîtiyek nû û qonaxek nû

H. Mizgin

Roja 20.4.1987'a parlamento ya Filistinê li paytexta Cezayirê civiya. Ebû Nidal û hevalen wî civîn terk kîrin. Di navbera CDRF (Cepha Demokratik ji bo Rizgariya Filistin), CGRF (Cepha Gel ji bo Rizgariya Filistin) û AL-FETAH de yekîtiyek nû ava bû. Ji bili CGRF û CDRF Partiya Komunist a Filistin û hin gruben din ji tevi vê yekîtiyê bûn.

Civîna Cezayirê di têkoşîna Rizgariya Filistin de riyek nû vekir. Wek tê zanîn danûstendina sê hêzen hîmî ango CDRF, CGRF û AL-FETAH ji mêj ve qut bûbû. Helbet ji hev dûrbûna van hêzen hîmî zirarek giran dida têkoşîna gelê Filistinî.

CDRF, CGRF ji bo yekîtiyek nû hin şertan pêşkê kiribûn. Ji van şertan a girîng iptalkirina Peymana Ammanê ku sala 1985'an di navbera Y. Arifat û Qral Huseyn hatibû imzekerin û bi sînorkirina danûstendina RRF û Misrê bû. Helbet ev yeka ha ji bo CDRF û CGRF serkefinek girîng e. Lî belê ya girîng ew e ku RRF di helkirina pîrsa gelê Filistinî de serbixwebûna xwe biparêze, hêzen belabûyi bigihîne hev.

Bê şik pîrsa gelê Filistinî di helkirina pîrsa Rojhilata Navin de kevirekî hîmî ye. Helkirina pîrsa gelê Filistinî beri her tiştî girêdayî hêzen Filistinî ye. Hêzen Filistinî çiqas bi qewet bin û di rîvebirina siyaseta xwe de çiqas serbixwe bin dê hewqas ji bi ser bikevin.

Civîna Cezayirê ji bo têkoşîna gelê Filistinî qonaxek nû ye. Ji ber ku him CDRF û him ji CGRF bi cesaretik mezin û bi gavek girîng di vê civîn de besar bûn. Her du hêz ji bo yekîtiyê ji hin menfaatan fedakîri. Him CDRF û him CGRF serokatiya Yaser Arifat qebulkirin. Li gor li hevhatina van hêzen, ji bo progamek û hin komisyon hatin amade kirin. Van komisyonan dê xebata prensibên yekîtiya RRF'ê bikin. Tecrûbeyen salan ên RRF'ê ku ji danûstendina dewletên Ereb girtine wê ji van komisyonan re bibe ronahiye.

Gelê Filistinî hewcîyi yekîtiyekkî wisa bû. Wek tê zanîn di rojê dahatû de wê civînek li ser pîrs û pirsgirêkên Rojhilata Navin pêk bê. Civîn wê navnetewi be. Him Yekîtiya Sovyet him ji Dewletên Amerika Yekbûyi wê di vê civîn de besar bibe. Ji ber vê yekê ji yekîtiyek wisa wê rolek mezin bilize. Gelê Filistinî wê bi dengekî bi hêz bikaribe mafê xwe biparêze.

Him Yekîtiya Sovyet û him ji Suriyê û Misir ji bo vê yekîtiyê kîfxweşîya xwe beyan kîrin. Yekîtiya Sovyet di beyana xwe ya resmî de dibêje ku wê bi her awayî alîkarîya RRF û gelê Filistinî ne bike.

Yaser Arifat di ahaftina xwe ya di civîn de wiha got; "Em ji bo Filistîneke serbixwe ku paytexta wê Qodus e, têkoşîn di".

Bê şik pîrsa Kurd û Kurdistanê û pîrsa gelê Filistinî wek xelekîn zencîrê bi hev girêdayî ne. Bişâftina yek ji van pîrsan bişâftina pîrsa din nêz dike. Di vê babetê de barek giran, watiniyek girîng li ber hêzen Kurdistanî heye. Divê ji bo rizgariya welatê xwe em ji bigihîn hev. Nakokiyen li ber xwe ji ortê rakin. Bi yekîtiyekke zexm û fireh riya serxwebûna Kurdistanê kurtir dibe.

KOPENHAGEN

Radyoya Kurdi

Ev du sal in ku li paytexta Danîmarka Kopenhangenê radyoya Kurdi ya herêmî ku dighê 40 km hawîrdorî xwe, kar dike. Li gor beyanên karmendîn radyoya Kurdi, radyo nûce û roportajê Kurdi diweşîne li ser edebiyat û folklorâ Kurdi radiweste, cih dide muzik û stranên Kurdi.

Lê gazinên karmendîn radyoyê ji Kurdan hene, dibêjin ku tu Kurd alîkarîya wan nakan, ew bi xwe ji nikarin hemû hewcedariyê weşanê bi cih bînin. Loma, bangî hemû rîxistin, komele û kesen Kurd ên welat-parêz dikan ku têkîli bi wan re deynin, alîkarî û piştgiriya xwe bi wan re xurt bikin.

SWE:

JINÊN SOSYAL DAMOKRAT TIRKIYE Û IRAQÊ PROTESTO KIRIN

Yekîtiya Jinên Sosyal Demokratê Stockholmê nameyek rûreskirinê ji serokkomarê Tirkîyê General Kenan Evren re û yek ji ji serokê Iraqê Saddam Husêr û şand û da xuyakirin ku bi xurti li dijî êrîsa van her du dewletan ya ser gelê Kurdi in.

Her du name ji di 29'ê Adara 1987'a de hatine rîkîrin û tê de li dijî êrîsa 30 balafîrê Tirkîyê a ser Kurdistanê Iraqê tê rawestandin. Name her wiha, înkarkirina gelê Kurd nedana mafê wî yê mîlî û demokratik û hîndekariya zarokê Kurd bi zimanê Tirkî, ji protesto dike. Nama ku ji Kenan Evren re hatiye şandin ci daye cezakirina 6 jinên Kurd ên endame DDKAD'ê û li hember vê cezakirinê ji radiweste.

DU ŞAIRÊN DUNBULÎ

1- Heyran Xanima Dunbulî

Heyran Xanima Dunbulî, herçiqas baş nayê nasîn jî di derheqê wê de, di hin kitêb û kovaran de agadarî têr dayin.(1)

Li gor agadariyê van kitêb û kovaran, Heyran Xanima Dunbulî, ji malbata Mîrên Dunbuliyan, keça Kerim Xanê Dunbulî ye. Mala wan ji bajarê Xoyê barkiriye çûye Naxîcevan (Xoy iro li Kurdistanâ İranê, Naxîcevan jî li Azerbaycana Sovyetê ye), ji Naxîcevan jî barkirine çûne Wirmî (Urmîye), dû re mala xwe bîriye Tewrîz (Tebriz) û li wir bi cî bûne. Heyran Xanîm, li Naxîcevan jî diya xwe bûye.

Em nizanîn ku Heyran Xanîm kengî ji diya xwe bûye û kengî miriye, lêbeljî vê şîra wê tê fêmkirin ku di wextê çora (webaya) 1247'ê hicrî qemeri/1831'ê miladi de sax bûye. Heyran Xanîm di vê şîra xwe ya Farisi de wiha dibeje:

"Ey Xoda! Moslimîn helak şodend

Nowcevanan be zîrê xâk şodend
Maderan dilşikeste vo nalan
Morde sütayd behrê ferzendant
Ey Xoda! În bela şedid şode
Ferec ez xelq napedit şode."

Bi Kurmancî em dikarin şîrê wiha bi ma'ne bikin:

Xwedêwo! Musulman helak bûn
Ciwan hemû binax bûn
Dayik dilşkesti û bi nalîn
Mirîyan dişon jî dewsa zaroyan
Xwedêwo ev bela, bû belayek
mezin
Şayî ji xelkê nependi(winda) bû.

Heyran Xanîm nêzîkî heştê salan jiyaye û herçiqas dil girtiye, hez kiriye jî mîr nekirîye. Mihemmed Cemîl Rojbeyanî, perçesiürek Heyran Xanîm wiha wergerandîye Kurmanciya Başûr:

"Rê mede be waney hewa w hewesperest in bêne dîwanit
Xelk le dewrûberî şekir meges dûr exenewe
Gulzar xalek e le carey gulrengî to da
Dirke le dili min da, hezim lê ye legel to da le qefesa bim."

Kurmanciya wê:

Rê mede kesen kevneperest bêne dîwana te
Xelk mîşan jî şekir dûr dixe,
Stîri(dirik) di dile min de, razi me bi te re di qefesan de bim.

Di dîwana Heyran Xanîmî de,
nêzîkî pênc hezar beytên Kurdî,
Farisi û Türkî hebûne. Piraniya şîrîn wê li ser Ebas Mîrzay Qacar
(naibî seltene) û dê û xwîşka wî bûn.
Yek jî şîrîn wê yê Farişî wiha ye:

"Miyan comle mehrûyan tu yî serdefterê xûban
Roxet çon gûyê xor başed, buwed zulfê keçet çogan
Cemalî to buwed golşen. Çe golşen? Golşenê xûbî
Çe xûbî? Xûbiye Yûsif. Çû Yûsif! Yûsifî Ken'an
Do çesmê mestê to zâlim. Çe zâlim? Zâlimê kafir
Çe kafir? Kafirê rehzen. Çe rehzen? Rehzenê iman
Lebê le'ler buwed xonçe. Çe xonçe? Xonçeyê rewze(2)
Çe rewze? Rewzeyê cennet? Cennetê redvan(2)
Buwed xalê lebet Hindû. Çi Hindû? Hindûye sahir(2)
Çe sahir? Sâhirê fetne. Çe fetne? Fetneye dowran(2)
Zebanê to buwed bolbol, dehanê to buwed çeşme(2)
Çe bolbol? Bolbolê xoşgû. Çi çeşme? Çeşmeyê heyvan(2)
Buwed heyran to ra 'aşiq. Çe 'aşiq? 'Aşiqê bîdil(2)
Çe bîdil? Bîdile vale. Çe vale? Valeye heyran."

Kurmanciya şîrê:

"Di nava hemû zerîyan de tu yî serdefterê rîndan
Ruyê te wek goga rojê, biskêr te jî weka çogan
Cemala te weka gulşen(gulistan). Çi gulşen? Gulşena rîndi.
Çi rîndi? Rîndiya Yûsif. Çi Yûsif? Yûsifî Ken'an.
Du çavêr mest ên to zâlim. Çi zâlim? Zâlimê kafir.
Çi kafir? Kafirê rebir. Çi rebir? Rebirrê iman.
Lêvîn te yên sor wek konçe. Çi konçe? Konçeyê bexçê.
Çi bexçê? Bexçeyê cinnet. Çi cinnet? Cinneta xweşî.
Lêvîn te wek xala Hindû. Çi Hindû? Hindûye sérbaz.
Çi sérbaz? Sérbazê fitne. Çi fitne? Fitneye Dewran.
Zimanê te bibe bulbul, devê te bibe kanî.
Çi bulbul? Bulbulê xweşxwan. Çi kanî? Kaniya jiyan.
Heyran ji te r' bibe aşiq. Çi aşiq? Aşıqa tirsek.
Çi tirsek? Tirseka sersem. Çi sersem? Sersema Heyran."

Malmîsanij

Bîrantañen Generalektî

Tîrk

Cemal Madanoğlu
Wergê: Alîşer

-11-

Min ev kaxiz bi binê ên din ve zeliqand. Ciye îmzayê vekirîye. Celal Yuzbaşî îmza xwe avêt binî. Min jî mohra tabûrê li ser xist. Pişti re min kaxiz kir berika xwe.

Pişti ku min kaxiz kir berika xwe bahola xwe ya tedribê, kar-yola portatif, saqo û hemû tişteñ xwe ên din min li kamyona Ethem kir û min Ethem kışand quncık û lê temî kir. Wextê ku here ka dê bi ci awayî biaxive, li ser vê mijarê me li hev kir.

Ji bo birêkirina Ethem û dayika wî em giş berhev bûn. Yê me, dayika xwe li rexê şofê siwar kiribû û bi xwe jî li rexê wê pal da bû. Qamyon bi eşyan hatibû barkirin. Kesî nedizanî ku eşyayê min jî di nav wan de ne.

Gişka:

-Riya te vekirî be Ethem... digotin.

Celalê Yuzbaşî ji hatibû.

Pişti ku ji gişkan xatir xwest û hev himbêz kirin, Ethem bi aliye min de zivirî got:

De lo, min hêzekî (qit'e) ewqas mezin a tivingê makine teslimî te kiriye, ma tuyê li vir min birêki? Xwe bavêje ser teker(çamûrgir) qet nebe sed mêtre min bibe here...

-Bila dibe, min got.

Fermanberê Tabûrê:

-Roj wê li serê te xe, dev jê ber de, li vir rîwikirin baştire got.

-Bila dilâ wî nemîne Yuzbaşiyê min...

Min xwe avêt ser çamûrgirê, yên ku ji bo rîwikirinê hatibûn paş de vegeryan. Wexta ku em ji ber çavan dûr ketin, ez ketim hundîrê kamyonê. Em di Savur (Stewrê) û Midyatê re derbas dibin. Ez ji şofê re dibêjim ku:

-Pê li gazê ke...

Ez diqelgilim ku pê bihesin û telefoni cendirme bikin...

Lê, min karê xwe yê wir jî bi awakî tekûz çêkiribû, min takim teslimî çawusê gedikli kiribû.

Dawiyê em gihîstîn Mêrdînê.

Li Mêrdînê du-sê eskerên inzibat bazdan hatin ba min:

-Fermanberê Alayê te dixwaze.

-Baş e.

Ez derketim pêşberî Fermanberê Alayê, birê Ali Fuat Cebe-soy ê bi nañvî deng Yarbay (Serheng du) Mehmet Ali Cebe-soy ye.

Di Dibistana Leşkerî (Herbiye) de fermanberê grubame bû.

Min silav dayê. Wexta min got:

-Ez Cemal Madanoglu yê teymen (Sitwan du)...

Bi hêrs raberizi:

-Me serbazî û baweriya wezifê bi vî awayî hîni we kir? Tu çawa dîkarî serxetê berdi û biçi? Ev der serxet e...

Ji min deng tu ne.

Yarbay Mehmet Ali Cebe-soy diqire, ez bêdeng guhêne xwe didime.

Ji qirkirinê westiya û demekê sekinî:

-Ez ji te re dibêjim, tu tê nagîhi?

-Ez tê nagîhim ez benî, ez ji Tabura Hidûd a Cizîrê me...

Uuuuu, carek din dest bi qirînê kir...

-Ez benî, ez ji Tabura 7'an ya Hidûdê me...

-Belê ez dizanim, va ye telgraf, te serxetê berdaye û tu baz didi...

Yarbay telgrafê girtibû û req û req li ser masê dixist:

-Nabe, ji serxetê nayê bazdan, ez nikarim vê rewşa han ji te re qise bikim? Lo, tu Fermanberê Tivingê Makine yê Tabûra Hidûdê yê Cizîrê yi... Tu tê nagîhi?

Min got ku:

-Ez benî, li ser sicila min lêkolîn bike; ez ne ji wan serbazên bazdanê me, li gor emrê we ez diçim qursa kurmaytiyê.

Ü min ji berika xwe emr derêxist.

Yarbay emr girt û xwend;

Sekinî, fikirî, melheze kir û dawiyê rawestiya:

-Baş e, got, wê wextê here Urfa (Rûha) yê...

Ez derketim.

Dom dîke

Mihemed Cemîl Rojbeyanî, "Fermanrewayî Dunbulî-ye-kan le Tewrîz û Dêrûbêrî da", Karwan, Hewlêr, sal:3, no:33(Huzeyranî 1985), r:22.

Ji van kitêben jorîn "Tarixê Meşahîrê Kord" a Baba Merdûxê Rûhanî qala du şairîn Dunbuliyan din jî dike:

SAHÎBE SULTAN XANI-MA DUNBULÎ(ŞEHBAZ)

Li gor ku Baba Merdûxê Rûhanî ji Asar El-Sî'e (cild:4, r:212) û Xeyratû Hîsan(r:117) neqil dike, Sahîbe Sultan Xanîm keça Kerim Xanî Dunbulî yê û jîna Ebul Feth Xanî kurê Murteza Qulixanê Dunbulî yê Duduyan e. Xanîmeke zana bûye, li ser ilmî stîrka/ilmî nucûmî kitêb nivisine û sîr jî nivisine. Navê wê yê din (naznavê wê) Şehbaz bûye.

XERÎBÊ DUNBULÎ

Eli lawê Mihemed, lawê Ebdurezaqê Dunbulî, yek jî şair û zanayen Dunbuliyan e. Di dawîya sedsala 13. a hicrî (sedsala 19. a miladi) de jiyaye (binêre: Kitêba Baba Merdûxê Rûhanî, r:408 (Wi jî ji "Danışmendanê Azerbeycan", r:285 neqil kiriye).

Ev şair yek jî xwendevanên Kurden Dunbulî yê Xoy û Makû bû (Ev herdu bajar ji û li Kurdistanâ İranê ne). Xwendîna xwe li Dar-ul Funûna (üniversite) Tehranê temam kir, dû re li dibistana eskerî xwend. Di 1275'ê hicrî qemeri de (1859-1860'ê miladi) hukumeta İranê wî şand Parîs. Pişti xwendîna xwe, ji Parîs vegeziya İranê. Yek ji kitêben wî, li ser pêşdeçûna Awrâpayê ye. Yek jî ji Fransî tercumeyî Farisi kiriye (Ev kitêb li ser Fransa û Ingîstanê bi Çin re ye).

Binêre: Kitêba Baba Merdûxê Rûhanî, r:408 (Wi jî ji "Danışmendanê Azerbeycan", r:285 neqil kiriye).

(2)-Ev misra di kovara Nîştimanî de hene.

rakirina. Helbet hinek caran ji hukumeta Tirkîye re li hev dihat ku her du civakan bera hev de, lê bi tevayı ev yek jî re li hev nedihat. Sala 1849'a Kurdên Arçataxê (bakurê Zeytûnê) bi vê yekê hesîyan, dest bi serîhîdanê kirin û gîhaşin wê dereca ku eskerî hukumetê ji wir raqetandin û serxwebûna xwe ilan kirin.

Sala 1860'i meha İlonê hukumeta Tirkîye biryar dide ku bi temamî Zeytûnê ji holê rake û şerkariya Ermeniyâ û Kurdan di nav xwînê de bixeniqîne. Bi vî awayî bi serokatiya Xurşîd Paşa eskerî Tirk hicûmî ser Zeytûnê dike. Li wê yekê nanihêre, ku ji hukume-

tê re li hev hatibû ku hin qebîlê Kurdan û Çerkezan bikşîne aliyê xwe û bêlûkek Siwasê wan têxe nav eskerê xwe, lê hema li nav çiya û baniyên Zeytûnê rastî Ermenî û Kurdên çekdar hat. Wan esker xistin bin hesarê û wek ku dibêjin qenc ew bû ji mala xwe nehatibû, parêke eskerî Xurşîd Paşa tenê ji destê wan filitîn û şûnda vekişyan.(60)

Pişti vî şerî Zeytûnê, halâ civaka Ermenî û Kurdan Zeytûnê geleki xirab dibe. Hukumeta Tirkîye hê zêdetir dest bi zêrîndina û talankirina civakî dike, usa dike ku ew tu caran serê xwe hilnekin. Lî ew yek tu caran wan nade tirsan-

din, hê di ser de ew haziriya serîhîdanek teze dike li hemû quncikên Zeytûnê xebatek mezin tê kirin ji bo ku Ermenî û Kurda pêk ve dest bi serîhîdanê bikin.

Sala 1875'a disa Zeytûnê serbixweyiya xwe ilan kir. Hukumeta Tirkîye eskerî xwe şand wir, vê carê biryar dabû ku bi carekê de Zeytûnê hilde. Lî helbet ev yeka wisa hêsa nînbû. Ermeniya dest avetiş çek, Kurd ji hatin alkîriya wan. Dest bi şerekî nedîti bû, çığa diçû hewqas Kurdan alîkarî didan dosten xwe yên Ermenî. Temamîya Kurdan Haçînê û Elbistanê rabûn pê û li hemberî eskerîn Tirkîye şer kirin. Ermenî û Kurdan

bi hev re hicûmî ser wê para esker a ku li Meraşê bicî bûbû kirin û bi carekê de hincirandin. Tirkîye Sultaniyê dît ku serî di serîhîdana Ermenî û Kurdan a mîrxas dernaixe, eskerî xwe paş de kışand. (61) Pişti vî yekê Ermeniya û Kurdan a xwe kirin yek, ku nehîlin eskerî Tirk niğê xwe bavêje Zeytûnê û wek V. Mîlikşeyan dibêje, ku serîhîde yên Zeytûnê yên Ermenî têkiliyên xwe û yên Kurdan Koza-noglu hîn tekûzîtir dike û bi 100 hezar mîrên çekdar ve serbixweyiya xwe diparêzin. (62)

Dom dîke

ra kiriya Civaka Ermeniya û Kurda

-11-

KARLANÊ ÇACANI

بەزىزىهەر يە كامىن

مۇھىمەتلىك

CİROK

CİK...

Remzî Înanç

Werger: Zinarê Xamo

Royê ji bo ku karîba ji ser girê hember derbas ba û xwe bigahan- da deşte te digot qey dijwariyê dik- şine. Tîrjîn ku tîş bi tîş bela dikir mina sîvek zirav û dirêj bi ser derek nîşî ve daliq bûn.

Bakî hênik hêdî hêdî dihat û hinekî jî diqeçîlân. Ewrêni siplî kom bi kom bi alî rojava û bakur de ji xwe re ketibûn rê. Li vê dûza mîna ku bê ser û ber be li serê vî çiyayî her tiş bê deng û bê tevger bû. Li vê deşta wek kevzê kesk gulên maran, kulfîkên bûzê di vê bîstika bê hed û hesab xweşik de gişê wan bi carê de li ba dibûn, li hember hemû benderuhî dixwes- tin serê xwe tîk bigirtana. Ji berfa bê nabêna zivistana çûyi, ji barana wê û ji bayê bê eman sün de di vê siba dawiya Gulana ku buhar derbasî havînê dibû hemûyên wan heta tu bixwazî bi comerdîyek mişt ji renga û bînê tije bûn.

Gundê li dûzê yê bi sî, sîüpênc malan dibê nuha di xew de be. Bi meriv û heywanen xwe ve wê ji rojek bê deng û bê liv re bi xwe bîhesiya. Te digo qey ev gundê biçûk û bi ser û ber bi çitan, bi gîhayê hişk û bi dar û beran çar- hawîlî wî hatibû girtin. Bi alîkî xwe ve ji pala xwe dabû quntara çiyakî biçûk.

Ji şikeftik gelek mezin ya çiya- yê ku deşt himêz kiribû, sûbayekî (zabitakî) serê xwe dirêj kir.

Westê, bêxewiyê sûbay hin bêtir kal nişan dida. Li jîr, li gund nerî, qesawet, bi bîntengî ji yê kîleka xwe pîrsî:

— Hûn hazir in?

Onbaşî li ser navê gişa bersiv da:

— Em hazirin qumandarê min!

Sûbay keserek kûr kişand. Tew

venegeriya li pişt xwe ji nenêri.

“Îş em dikin pirr zor e yaho... Çi hewcye hewqas dirêjkirin? Bi vê kişandina eziyetî bi mirovan? Dibê meriv biçûkîn wan, mezinîn wan, pîrekîn wan û keçen wan li orta gund kom bike û bide ber gullan. Heger tuyê bîbêjî ev ji pirr bi teq-req e, wê çaxê çend bom- bênen destan bes e û zêde ye ji. Ma gelo hêjâyî karekî hewqa bi zah- met?”

Berjî girtibûn ser hin gundan, bê jîmar meriv kuştibûn. Carekê birê wî yê ku ji zûde ew nedîtbû, hatibû dîtina wî. Bi hev re çûbûn gundekî. Birayê muhendiz ku hin nuh ji Ewrûpayê hatibû, li wî gun- dî, laşê merivan wek gûşî û gulû-

kan bi dara ve daliqandî, çewaleki ji guhê meriva dagirtî dîtibû û gurûziyê ew girtibû. Sûbay wê gavê ji nişka ve birê xwe bi bîr anî. A nuha tişten ku dikir bikra bidîta kî zane wê çuqasî hêrs bibûna, biazîra. Û wê cardin birê xwe fedîkar bikira. Wê li ser qedr û qîmeta însan û haysiyet û hurr fiki- randîne nutuq bîkşanda.

Qumandar xwe da kîlekê. Hest leşker pengizîn der. Di desten wande bîdonen gazê yên biçûk, tivingen wan li mil bi bez daketin rastê. Hinekên wan di nav dudilî û heyecanek muphem de bûn û dilerizîn. Hinekên wan bi tirsek tevlihev li ba dibûn. Hinekên wan ji wek merivên ku berpirsyariya dîtina xwarin û vexwarinê ji hevalen xwe yên of rewşek muhtac de di dile xwe de his dikirin. Gava daketin deşte bi du milan de ji hev qetiyân. Çaran berê xwe dan alîkî, carên din ji berê xwe dan aliyê din. Bi bîdonen di desten xwe de, dar û beren ku çarhawîlî gund girtibû gaz dikirin. Li serê jorî gund heşt leşker hatin ba hev. İcar ber bi aliyê ku jê hatibûn, çembera qazîyâgî agir berdanê û bi xar ji wir bi dûr ketin. Çaxa gihîstîn ser gir, edî li ber binçikandîn bûn. Ji nav wan yeki, her çiqas xwe hazir kir ku teknilî bide qumandar ji, lî di dûr dev jê berda. Her tiş gelekî vekerî li ortê bû edî.

Qumandar ji xwe bê hay û bi xem û xeyal bû. Ji wê gava ku leşker bi bîdonen gazê şandibûn gund û vir de, heta vegera wan bê ku çavê xwe ji bîqrucine wer temaşa wan kiribû. Ew gundê ku heta bîstik berê di xewek bêbinî de bû, nuha di bin agir û dûxanê de mabû. Di jiyana xwe de cara pêşî û bizinan.... Giş li hev digobilin û mîna dengê gujînekî digihîstîn ser gir. Li pê bîna goşte kîzîr û hîriyê...

Yêni li ser gir wê gavê fena ku li filmekî tîrsê temaşa diken, bêtir xwe kutan bin çengen hev. Bê ku haya wan jê hebe desten wan qundaxê tivingan zeft kirin. Bes qumandar cardin bi tenê li ser nigâ sekinibû. Serê xwe di nav her du destê xwe de digişt. Qumandar, ev cara pêşin bû ku li ba leşkeren xwe hewqasî perşan û ji dar de ketibû. Ger nuha ji leşkeran yek bîpeyivya, ya ji gotinek bigota, dibe ku karîba bîkşanda û berda-

Qumandar wê gavê, hebûna alêtén herî modern yê nemirandin xeyal kir. Di yek bînê de dajot ser çembera êgir û giş vedimirand. Li hember gelê gundên serîhilda- ne yan ji yêne kesê serîhilda veşar-

Remzî Înanç (52 salî) Kurd e û ji Diyarbekirê ye. Du kitêbên Remzî Înanç yê çîrokan hene. Navê yekê Adle ye (1965) û navê yekê ji Sey e (1965). Me ev çîrok ji Kitêba Şey (Çîk) tercume kir. Kitêbê navê xwe ji navê çîroka ku me tercume kiriye girtiye. Bêî van her du kitêban, gelek nîvîsên Remzî Înanç di kovar û rojnamên Tirkî de hatine weşandin.

tine, ma wê bi vî hawî şer bibûna? Gava berradayitiya hatina emrên ji amirên wan û qabiliyeta itîata xwe di bîr danî dile wî ji wî dixeliya. Gelo hevalki wişy sîbata yî din wê karibûna ji fermanek weha re bigota erê? Qumandar ji nişka ve li zarokên xwe yên ku wê gavê jê dûr, fikirî. Nuha pixe-pixa wan bû radiketin. Bi dehşet heziya. Serî kir ber xwe. Bêtir qefili, bi carkê de heziya.

Leşkeran nuha fena ku çewt dest bi listika êgir kiribûn, di nav tirsek meşhûl de ruyên xwe ji hev diguhurandin. Di nav wan de yênu ku ji vê herêmê bûn ji hebûn. Heger çembera êgir carê bîhata li ser gir bi wan bigirta, wê nikaribûna bigotana kirt. Di nav mahcûbiyetek ku jê re nikaribûn sînor danyana, di nav sîcûdaryekê û di nav sînorê çembera mesûlyetê de bûn. Leşkerekî, gundê di nav dûxan û êgir de bi manqelek mezin tije êzing ku hîn nuh hevdû girtibe şîband. Yekî din, bi salan berê, çaxa zarok bû, filimekî ku bi bavê xwe re temaşe kiribû anî bîra xwe. Li wir ji rebîrrin girtibûn ser Gund wexta çûyînê gund li pê xwe şewitandibûn.

Piştî bîstekê bayê siba havîna hênik li deşte dest bi seyranê kiribû. Tîrjîn royê yênu ku diketin deşte, li ser Gundê di nav dûxan û êgir de, mîna hulmek muweqet xwe qîç dikirin çembera êgir pêlen xwe bi alî ortê ve dibr. Pêl digihan hev, li hev digobilin û hol dibûn, çîrisk çîrisk li ortê dizîzîkîn. Wek ku dixwestin qul bikin, hilweşinîn. Di vê nabênen de ji nav êgir û dûxanê dengin hatin bîhistin. Dengê pîrek û peyan, zar û zêcan. Dengê heywîn. Yê hespan, keran, pisik, mişk û mangan. Mîh û bizinan.... Giş li hev digobilin û mîna dengê gujînekî digihîstîn ser gir. Li pê bîna goşte kîzîr û hîriyê...

Ev çiyayê ku qumandar û leşker li ser bûn û ev gira, hemû çiya û girêni li ruyê erdê yekê wan ji nebûbû şahidê hedîsak wiha. Çiyê ji çiyatiya xwe û gir ji girtiye xwe fedî kir. Temamê gîha û külîkîn ciyê, negavê serê xwe ji laşê xwe bikrana xwe tîk kirin. Mar, dûpişk, koremar, beq, kurm û kêz, kûsî, marijok, gêre, kêzîken bi per, bê per, giş rabûn pê. Di her tişti de lerizandinekî dest pê kir. Dûmana wek bêtarekê mezin, hov û reş ji deşte bilind dibû dixwest xwe bîghîne ewrêni sipî.

Her du zarokên li ber bayê sîbê bi fistanen xwe yên çik sipî hîl dibûn, di qulika ciyê de lekêni reş tavilê ji hev negerandin. Çavên wan reşve hatibû. Di dûre keçikê, destê birê xwe hin bêtir gîvaşt.

Bes karîbu bigota:

-Leşker !..

Di nav demek ku meriv çavê xwe bigre û veke, xwişk û bîra di yek hilme de wek ku bifîrin dake- tibûn jêr. Bi wê şipê û bê tîrs ketin nav çembera êgir.

Arêkerdox: Mihê 'Elîşan

dê xo ra xo rê yewna merdim vîne- na. No mîrdim yeno dekeweno axûrê yînî miyan. Cenik yena mer- dey xo heti ardan vêcena û mîr ala- wena. Wexto ki mîr alawena, vana:

-Mérdek timanenê mi roni ez şêra tekê awi birîşna, bêra.

Merdek timanenê ci roneno cenik şîna axûr di a wû mîrdeko bîn gurey xo qedînenê; cenik yena, merdey xo ra vana:

-De timanenê mi banci cor.

Merdey ci timanenê cenîya xo anceno cor. Cenik mîrê xo alawena û vana:

-Merdek mi to rî nîva cenî nîpâ- wiyyêna. Bewnî çimanî to ver di ez newe şîya mi gurey xo vîras, qedîna, ez ameya. Neya tepeya ez hinî cenîyey to niya çimki bawerîya to bi min çinibî !

Cenik û merdek yewbînan ra abi- riyyenê.

Mérdek vana:

-Ez şena to bipawa.

Cenik hêrs bena û qestê merde-

DI DEYÎRÎ:

Arê kerdox: Koyo Berz

Xopanî

Xopanî Xopanî,
Kezîya mina pahnî,
Avêti Dolda Xanî,
Bê veng û bê gumanî.

Dola Xanî tarî ya,
Bezna (Bejna) keji barî ya,
Zey tîlda tembûrî ya,
Vengê lûlîda şîwanî ya.

Dola Xanî qamîş o,
Maran miyan di fişîş o,
Birayê mi çawûş o,
Bê şan û bê ümiş o.

Dola Xanî lîmin a,
Masan miyan di gumgum a,
Bê bin û bê qamin a,
Cin û cinawîrî rî xanim a.

HINDIK*****RINDIK

Yê amade dike: Z. XAMO

ME DERSA WAN NEDÎTIYE

Li gundekî Hekariyê müfetiş teftîşa dibistana gund dikir. Ji şagirteki biçûk pîrsî:

— Ka ji min re bêje lawê min, ker mezin e, ya hesp?

— Şagir bi hêsanî got, "hesp mezin e". Müfetiş got eferim ji te re, tu pîr bi aqîl... Dûre vegeviya ser yekî din, jê pîrsî?

— Lawê min ka tu bîbêje, ma hîrc mezin e ya rûvî?

Vi şagirî ji rast bersiv da, got; "hîrc mezin e". Li ser viya berê xwe bi şagirteki din de kir, jê re got:

— Lawê min Ataturk mezin e ya Evren?

Şagir tavilê bersîva müfetiş dayê;

— Me hîn dersa van heywanan nedîtiye efendim...

NAMA ABDULHEMÎD

Abdulhemîd Yekemîn, padışahê dewleta Osmani yê 27'ân bû. Di harema wî de ji, wek hemû padışahan gelek cariye hebûn û wî car-carna ji van re nameyên evinê dinivîsand. Wî di nameyek xwe da ji Rûşhah xanêmî re wisa nîvîsandibû.

"Rûşhaha min, Hemîdê te bi qurbana te be; Xwedê wê ji bona vê qusûra min ne xeyle. Efendim, ez qûlê (kolê) te me, tu dixwazî lêxe, dixwazî bikuje, ez teslimî te me... Ez bi dora te me, ji bo Xwedê işev were. Eger tu neyê, tu yê min nexwes bixînî û belkî ji tu bîbî sebeba mirina min. Ez cav û rûyê (wecê) xwe di binê nigê te didim û rica dikim. Bi newalek Quran ez nikarim xwe zeft bikim..."

Not: ev name ne mîzah e, raste.

TU JI KESÎ RE NEBÊ

Rojekê Kenan Evren li Floryayê dikeve bahrê, ajnê dike. Çima hinekî bi nav avê de nare û naweste; dike çelpe-çelp, ge bi bin avê dikeve, ge bi ser avê dikeve. Ji sihûdê re masîvanekî li rexê bahrê xwe dighîne û xelas dike. Piştî demek kurt hişê Evren tê seri, ji mîrik re dibêje:

— Eê brako, te ez ji mirinê xelas kirim. Li ruyê dunyayê tu ji min ci bixwazi ezî bidim te. Hema destê te ji tire; tu dixwazî ezî di ordiyê de meqam û rutbê bidim te û ya ji qesr û qonaxa?

— Errîk ! ma tu hewqa dewlemend i lo?

— Qey ez dewlemendim! Ma te nizanibû? Ez serokê cûntayê û serokomarê Tirkîyê General Kenan Evren im. Te çawa ez nas nekirim?

Li ser viya masîvan dibêje:

— Emmam eman, ez ketime bextê te; ez ne rutbe û ne ji qesr û qonaxen te dixwazim. Bes hêvî û rica min ji te ev: tu yê ji kesi re nebîjî ku min tu xelas kiriye. Ku gundiyen me bi vê yekê bihesin wê min zîfîl zîfîl bikin.

DI DİROKA
ME DE
EV MEH

1 Gulan 1979: Li Kurdistanê, li bajarê Bedlisê cara yekemîn 1'ê Gulanê wek mitingê hate pîrozkirin

5 Gulan 1932: Li Tirkîyê bîryara sirgûna Kurdan hat stan- din. Li gor bîryarê li ciyên ku Kurd surgûni wir dibûn, divê Kurd ji %5'ê Tîrkan ne zêdetir bûna.

7 Gulan 1877: Rûsa Ardaxanê işsal kir.

7 Gulan 1978: Mehmet Koç ji bal axan ve hat şehîdkirin.

8 Gulan 1979: Li Sertê li dijî girtina Enstituya Hindekarî (Eğitim Enstitüsü) DDKD mitingek pîkanî.

11 Gulan 1919: Serîhildana Eliyê Betê.

</div

ENDAMÊ PSKT Û YEK JI BERPIRSYARÊN KOMKAR'Ê

Ramazan Adiguzel hat kuştin

Roja 3'yê Gulanê Apociyan li Hannoverê, bajarê Almanya Federal endamê PSKT û endamê Komîta Giştî ya KOMKAR'Ê, Ramazan Adiguzel kuştin.

Li gor beyana PSKT, Ramazan ev 10 salin ku endamê partiyê, zewicandî û bavê sê zarokan bû, ji ber xebata xwe ya şoşegeri berî 12' ilonê çend caran hatibû girtin. Piştî hatina hukmê faşî, ji ber ku lê digerîn derket dervayî welat û sê salan li Kurdistanâ İranê pêşmergaya tî kir.


Pskt di beyana xwe de vê yeke da nişandan ku: "Erişgeriya Apociyan dijî rêxistin û kesen welatparêz, ne tiştekî nû ye. Tevgera Apociyan, ji roja derketinê heyâ tro, tim rêxistin û kesen welatparêz ji xwe ra wek dijmin nişan da, êrîşî ser wan kir û gelek xwîn

rijand. Xuya ye ku ev ne rê û ola-xên rêxistineke weltparêz in. Ev kiryarê han bi tevayî gora rêxistineke provakator in."

Roja 9'ê Gulanê li dijî vê kuştin meşek pêk hat, zêdeyi 4.000 kesi tevi meşê bû, ku gelek kes û rêxistinê Alman, Tirk, Kurd tê de besdarbûn.

Pireka Eli Xoce ji meşvana re spas kir ku wan di vê roja teng de ew bi tenê nehşetin û got ku, "Ez wekî Kurdeke şerm dikim, ku çawa hîn ji partiya Apociyan radi-be bi navê gelê Kurd mijûl dibe. Ez bawerim ku wê rojekê gelê Kurd hesabê vê yekê ji Apociyan bipirse.

Partiyen di eniya CUD de ne (Partiya Komunîst a Iraq, Partî Demokratî Kurdistan-Iraq, Partî Sosyalîstî Kurd-Iraq, Partî Sosyalîstî



Eli xoce (Ramazan Adiguzel)

Kurdistan, Partî Demokratî Geli Kurdistan, Partî Sosyalîstî Iraq), Partiya Demokratî Kurdistanî İran, KKDK û KOMKAR bi hev re belavokek belav kîn û ev cînayeta Apociyan protesto kîrin.

Turkiye Dixwaze Destê Xwe Dirêjî

Kurdên Derva Jî Bike

Di hejmara 18.04.1987'an a roj-nama Tercuman de carek din li ser mesala xwendin û nivîsandina Kurdî ya zarokên Kurdan ên li Swêd di dibistanan de, derew û enformasyonê serûbinî hevkirî hat belav kîrin. Li gor nûçevan T. Hacikadiroglu, bi alikariya hukumeta Swêd mamostên Kurdî zarokên Tirkan hînî Kurdi dîkin û wan li ser dirok, edebiyat û hebûna Kurdan têdigezin. Nûçevan bin-gehê vê nûça xwe dibe bi nivîsandinek kovara Komkar ve girê dide û bi zaneti vê kovara han ji organa weşanî ya PKK'ê dide nasandin. Nûçevan bi vê tenê namîne û meselî li ser xurtkirina bingeha dijî komunîzmî dibe bi Yekîtiya Sovyet ve ji girê dide û bi vî awayî derew û nîjadperestiya xwe didomîne.

BANGA TALABANI

Daxwaz û hêviya min ew e, ku hûn dê li pişta birayê xwe û ku ketine rewşa man û nemanê rabin:

-Kar rawestînin, xwepêşandanen pêkbînin û wan rûres bikin.

-Doz li Firansa, Yekîtiya Sowyetan û Misrê bikin, ta ku çek nedîn Saddam Hisênenê xwînrej û hevkarenî wî ên zordar.

-Ji bo girtina tola birayê xwe û ku li Kurdistanâ Başûr bi çekêni kîmyayî têne kûstîn û seqet dibin, li hember faşîstên hov yekîtiya gel pêkbînin û zorbazn bikujin.

Îro Saddam Hisênenê Xwînrej ji bo nehiştina gelê Kurd cengeke mezîn li dar xistiye. Ji bo em bikarîn berê cengê biguherîn û wê bikin cenga ruxandina daw û dezgahê sazimana Saddam faşî, em çavnerîya alîkarî û piştgiriya hemî Kurdîn bi şeref ên li cihanê ne dîkin. Bi hêvi me û bawer dikim ku hûn dê bi vatiniya xwe rabin.

Bijî Kurdistanâ azad û demokrat, ku gelê Kurd bikaribe tê de mafê xwe yê çarenîsi bikarbîne.

Mirin û rûresi ji bo Saddamê hov û faşîst.

**Birayê we Celal Talabani
Sekreterê giştî e Yekîtiya Niştimanî Kurdistan
22.4.1987**

KU ŞIVANÊ PEZ GUR BE

Komîta Merkezî Turgut Atalay ji endamîtyê xist û ji bo ji partiyê avêtinê dawe lê vekir ku çîma di cîvîna herêmî ya Partiyê de (ku li Sérte civîya bû) doza tercumekirina programa partiyê bi Kurdi kir û xwest ku Kurd karibin navê Kurdi li zarokên xwe kin. Erdal Înonu ïdsâ kir ku Turgut Atalay (Diyarbekir ye û Kurde) bi vê yekê cudadaxwazîye teşwîq dike, loma jî liqê Diyarbekir ê partiyê jî fesih kir. Rojnamen burjuwazî yên kevneperest bi rojan li ser peyvîn Turgut Atalay rawestîyan û gotinîn wî weka reşikên şevê girtibin ser Turkiye tefsîr kirin.

Van bûyeran hemûyan bi carekê de dan nîşandan ku, ji xwe demokrasî li Turkiye tune, her wiha riya şerî demokrasiyê jî hîn dûr û dirêj e, hîn gelek asteng li ser devê rê ne. Ma gava ku, yên xwedêgiravî di şerî demokrasiyê de ne, ne demotrat bin gelo wê çewa ev asteng rabin û wê çewa hêviyek nêzîk ji demokrasiya Turkiye bê kirin. Ku şivanê pez gur be wê ci xêr ji wî pez bê.

Partiya Pêşeng 12. saliya xwe pîroz kir

Di 22'yê Nîsana çûyî de Partiya Pêşeng 12 salen jiyana xwe temam kîrin, ket sala 13'an. 12 saliya partiyê li hundur û derveyî welat hat pîroz kîrin.

Li hundurê welat, li ser 12 saliya partiyê belavokek bi navê "Her

tiş ji bo PPKK'ek hê bi hêztir" hat belavkirin. Di belavokê de li

**BIJI 12 SALIYA
P.P.K.K.**

**Riya P.P.K.K. rîya xelasîya
mîletê Kûrd'ê**

P.P.K.K.

Pûlek ji wan pûlen bi munasebeta 12 saliya PPKK li welat bi dîwaren ve hatibû zeliqandin

DANIMARKA

Karanîna bombê kîmyewî hat protestokirin

- * **Kurdên li Danîmarkayê meşek çêkirin.**
- * **Partiyen çep ên Danîmarkî di meclîsê de bîkaranîna bombê atomî protestokirin.**
- * **Xaça Sor hat ziyaretkîrin û alîkariya derman jê hat xwestin.**

Li Danîmarkayê bi însiyatîfa Komîta Piştgiriya Kurdistanê gelek xebat hatin kîrin, ji bo protestokîra Iraqê ku bombê kîmyewî li ser gelê Kurd bi karaniye.

Partiya Sosyal Demokrat, Partiya Gel a Sosyalîst û Partiya Sosyal Demokratî Çep di parlamento de bi hev re beyanek dan. Di vê beyanê de rejima Iraqî tê rûreşkîrin û piştgîri bi gelê Kurd re tê nişan dan.

Grubek Kurd çûn Xaça Sor ziyaret kîrin. Ji Xaça Sor hat xwestin ku heyetekê bişîne Kurdistanâ Iraqê û netîceyên bombê kîmyewî di cîh de bîvîne. Û dîsa ji wan hate xwestin ku alîkariya tîbi ji bo gelê Kurd bê kîrin.

Roja 8'ê Adarê Komîta Piştgiriya Kurdistanê bi meş û mitîngek vê kampanya xwe bir serî. Partiya Komunîst, Partiya Sosyal Demokratî Çep, Partiya Gel a Sosyalîst û çend partî û rêxistinê radikal jî piştgiriya vê meşê kîrin. Meşvan heta meydana belediya Kopenhangê meşîyan.

ONAMEYA YUNANISTANÊ

Newroz, wekî li her derê Ewrûpayê li Yunanîstanê jî hat pîroz kîrin.

Newroza îsal ji bal hêzên Turkiye Çep hatibû amadekirin û li gor salen berê hîn bi sistem û zengîntir bû. Gelek partî û hêzên demokratîk bi nûnerên xwe ve di şevê de besdar bûn. Ji vanâ çend kes ev in; li ser navê Piştgiriya Navnetewî ya Demokratîk a Yunanîstanê; Nikos Fotiadis, ji Komîta Aşîti û Xweşî ya Navnetewî ya Yunanîstanê; Yorgos Mustakis. Ji Komîta Rêvebira Merkezi ya Ciwanîn Komîst yên Yunanîstanî (KNE); Etathis Kostas, ji Partiya Kominist a Yunanîstanê Yorgos Dolianitis.

Li Yunanîstanê van du-sê mehê dawi xebatên jîrîn çebûn;

1- Di 4.3.1987'a de ji bo protestokîra êrişâ Turkiye a ser Kurdistanâ Iraque, Komîta Koordinasyona Yunanîstanê a Yekîtiya Çep belavokek ji bo pressê belav kîrin.


2- Dîsa li ser vê yekê, bêyî Apociyan hemû rêxistinê siyasi yên Kurde û Tirk ên li Yunanîstanê temsîl dibin meşek çêkirin. Meşvan heta ber konsolosê Turkiye meşîyan.

3- Li ser 20 saliya damezrandina DîSK'ê (sendiqâ karkeran e) Yekîtiya Çep belavokek belav kîrin. Belavok of Organa Merkezi ya Partiya Komunîst, Rîzospastis û di hin rojnameyên demokrat de derket.

ser têkoşîna 12 salen PPKK' hat rawestandin û hat beyankirin ku "PPKK, di vê dema ku 12 saliya xwe pîroz dike, hewl dide, ku ci li tevayıya Kurdistanê, ci li perçê Kurdistanê yê di bin destê Tirkîyê û ci ji di nabera gelê Kurdistanê û Tirkîyê de têkoşînek muşterek bê avakirin û xurtkirin. Baweria wê ewe ku ji bo rî li ber ixa-net û teslimiyetê bê girtin, ji bo provakasyon û komployen dijimin bê pûckirin û ji bo daxwaza dijimin neyê biserketin, divê yekitiya hemû hêzên milî û demokratiyê bê avakirin.

Ji bili belavokê afîş û pûlen dîwaren ji hatin belavkirin.

Li dervayî welat ji li Hannover'ê di 25'ê Nisan de şeva pîrozbahîyê hat pîkanîn. Di şevê de axaftinek li ser navê partiyê hat kîrin, bi slayt (dia)an têkoşîna 12 salen partiyê hat nişandan. Sitran û govendên Kurdi raberî besdarîn şevê hat kîrin. Şev bi aheng û këfşeyî hat derbas kîrin.



M. Şirin Tekin

Destpêk di rûpelê I'ê de
KEVNEPERESTAN XORTEKİ
ŞOREŞGER
ŞEHİDKIRIN

gelek kesen ku di meha remezanê de rojî nagirin di çayxaneke pençerên wê perdekirî de rûniştibû, xwarina xwe dixwar. Di vê navê de grûbek ji 20-25 kesan pêkhatî di desten wan de kîr û dar êris birin ser çayxanê û M. Şirin Tekin şehîd kîrin.

Ev hedîsa han, bixwaze nexwaze mirov dibe deh-donze sal berî nuha. Wek tê zanîn, wan navan heraka faşîst û ya kevneperest a Turkiye li ser Kurdistanê pîlanen taybeti dimeşandin. Wek dixwes-tin, ku sê bingehan ji bo xebata xwe li Kurdistanê pêkbinin. Noxta yekem Erzurum a diuydan Ele-zîz û ya sisîyan ji Wan bû. Vê armâna xwe her çiqas bi demokîji be di du bajaran de pîkanîn, le di gel hemû xebatên xwe yên tarî û qirê dîsa ji li bajarê Wanê nikaribûn biserkîn. Piştî vê bûyerê mirov nema dikare bi bîr neyne ku ew pilana di nîvî de mayî gelo car-din dixwazin bi ci bikin?

Kuştina M. Şirin Tekin li welat hat protestokîrin. Partiya Pêşeng

YEKÎTIYA MAMOSTEYÊN KURD LI SWEDÊ HAT DAMEZRANDIN

Di 4'ê meha Nisan de, li Stockholmê Yekîtiya Mamosteyen Kurd, kongra xwe ya damezrandinê pîkanî. Di vê kongrê de nêzîki 30 mamos-teyên Kurd, ji her çar perçen Kurdistanê amade bûn. Bi awayekî demokratik, pirs û pirsgirêkên dersdan û xwendina zimanê Kurdi li Swedê hat behskirin. Her weha projeyê destûra yekîtiye yê ku ji aliye komîta amadekar hatiye berhevkirin, bi hin guherîn sivik hate pejîrandin.

Piştî Komîta Karger hate hilbijartîn, kongre dawî hat.

Qamîşlo-Dêrik

**"SERÊ DÎREKA ALÊ BIGÎHÎJE KU,
SÎNORÊ ME JÎ LI WIR DESTPÊ
DIKE"**

Ev çendake ku qereqolên Tirkan yên ser sînorê Suriyê, ji xwe re tiştek nû icad kirine. Dibêjin, ew direka (martak) ku qereqolên Tirkan ala xwe pê ve dadiçikînîn, wexta ba lê dixe yan ji aliye wan de bi qestî tê xistin, serê çîma wê bigîhîje ku, Tirk têla sînor tîni ber serê çîma wê datinîn. Ji "qudreta Xwedê ye" ku her tim ber bi Suriyê de dikeve. Heta nuha du-sê car li Endîwerê û carkê-du car ji li Serêkaniyê ketiye û Tirk ji qasî dirêjahiya wê ji xwe re axên nû işgal kirine. Endîwerê dibêjin; "ger wiha be çend sal şunde sînor dê bigîhîje Dêrik". Belê, Mesela işgala xef û ya bê qîr û qelebalix ev e. Taktikîn nû ya cüntaya faşîst perçek ji politika wê ya der ve ye.

Destpêk r.1

BOMBÊN KÎMYEWÎ

dén me li jor bi nav kir, roja 16.4.1987'a de hat bikaranîn. Roja 15 û 20'ê mehê ji li dijî van gun dan hat bi karanîn:

1- Balşan, 2- Kanîberd, 3- Zînî, 4- Belalûkan, 5- Dereşîr, 6- Min-tiqâ Sawsyûkan û gundê Şêx Wesan ku 85 mal û nêziki 450-500 kes lê dijîn.

Nav û ale kesen ku bi bomben kîmyayî sehid ketine ev in:

- 1- Seid Osman Kerîm (5 salî)
- 2- Fatîme Osman Kerîm (6)
- 3- Rizgar Osman Kerîm (7)
- 4- Edibe Osman Kerîm (8)
- 5- Stér Osman Kerîm (9)
- 6- Husen Osman Kerîm (15)
- 7- Husen Mecid Selim (3)
- 8- Selam Mecid Selim (4)
- 9- Emîne Mecid Selim (9)
- 10- Selim Mecid Selim (10)
- 11- Rîbûwar Eli Resûl (2)
- 12- Xezal Hesen (2)
- 13- Naznîn Hesen (2)
- 14- Serbaz Mihemed Husen (15)
- 15- Rêzan Eli Resûl (4)
- 16- Sîrwan Seid Ebdulla (3)
- 17- Meryem Eziz Hesen (6)
- 18- Eysa İbrahim (6)
- 19- Hesen Xurşid (6)
- 20- Xetice Xurşid (7)
- 21- Xelîl Silêman Xidir (8)
- 22- Resûl Silêman (16)
- 23- Fatîme Mihemed (55)
- 24- Emîne Xidir (35)
- 25- Xetice Mehmûd (35)
- 26- Zelixha Mehmûd (30)
- 27- Fatîme Ta (40)
- 28- Heyat Hemze (25)
- 29- Emîne Ehmed Haci (25)
- 30- Xetice Ebdulla (19)
- 31- Hêmîn Yûnis (2)
- 32- Kerîm Mehmûd Eli (85)
- 33- Haci İsmail (80)

Li alî din rejima diktatorî zore

dide ser gelê herêmên Dihok, Musil û Hewlêrê (Erbil) ku di nav 20 rojan de ciyêñ xwe biterikinîn biçin kampan.

Bes li Dihok û Musilê û navcêñ der û dora wan 240 gund bi zorê hatin valakirin û xelkên wan hatin sirgûnkin. Ji van gundan navê hinekan ev in: 1- Bîsrî, 2- Berrî-behar, 3- Sarkî, 4- Spîlkî, 5- Bîbâz, 6- Kanika, 7- Kanî hecerkî, 8- Ser-tenkî, 9- Alweka, 10- Sîcî, 11- Germava, 12- Haci axa, 13- Ser-jori, 14- Dolî. Ev gundana bi taybeti li derdora nahiya Mengêş in.

Ji qeza Semîl hin gund:

1- Kersîl, 2- Kifela, 3- Heşki, 4- Darî, 5- Hejîrkî. Li vê mintiqê 45 gund dinava pilana sirgûnê de ne.

Ji qeza Zaxo navê hin gundan:

1- Çem Bihîfa, 2- Deşt Jêri, 3- Xalis, 4- Darî, 5- Sîndafa, 6- Der-gel, 7- Gundek, 8- Celala, 9- Ewer Afa, 10- Xirabekî, 11- Tawkî, 12- Şîrans, 13- Mamîsa, 14- Zînafa, 15- Yusif Axa. Li gel van ji nahiya Rizgarî, Derkan Ecem û nahiya Batûfa ji di nav vî pîlanê de ne. Dervey van 104 gundan ditir ji nav pîla de ne.

Ji qeza Îmadîye 25 gund wê bêñ sirgûn kin. Ji nahiya Sersing:

1- Şermîn, 2- Zîveh, 3- Şêx Memâ, 4- Bamîrnî, 5- Botiya, 6- Şerîfa, 7- Aşawa, 8- Serdaravî, 9- Limazika.

Ji nahiya Kanîmasî:

1- Rafîna, 2- Batûfa, 3- Elkêş-kî, 4- Girkâ, 5- Xeşxaş, 6- Çem Seyda.

Nînowa : Ji qeza Eqra 31 gund sirgûn dîbin. Ji van navê hin gundan:

1- Nehîya Şermîn, 2- Gundê Bakîman, 3- Dînartê.

Ji qeza Şexan 15 gund û nahiya Etrâs. Ji van gundan hin nav:

1- Eden, 2- Armaş, 3- Dehlane-wî, 4- Bibozî, 5- Dêra Xetra, 6- Azîh, 7- Sîdarkî.

Ji nahiya Qûş:

- 1- Tixyan, 2- Gabaran, 3- Xwerzan.

MÜSİL : Li gor biryara nîzama Seddam kesen Kurd ên ku ji 50 salî berjêr û li nava bajêr bi cî bûne ji wê bêñ sirgûnkin.

HEWLÊR (Erbil) : Taxa (mehela) Latîf Awa, taxa Mecîd Awa û hin gund:

1- Balşan, 2- Kanîberd, 3- Zînî, 4- Belarûkawê, 5- Şêx Wesan, 6- Hin gundan ciyayê Sawsyûkan, 7- Simamik, 8- Kendinawa, 9- Beranîn, 10- Hemû gundan li derdora Qûş, Teqteq, Teba û qeza Şeqlawa, qeza Kiwîsincik û qeza Rewandûz.

KERKÜK : Hemû gundan qeza Torxormato.

SILÊMANI :

1- Nahîya Axceler, 2- Binar, 3- Eli Awa, 4- Kela Zorda, 5- Bibîna, 6- Kanî Spike, 7- Darûnçe, 8- Qazan, 9- Yaxîşmîn, 10- Hilden, 11- Bergelo, 12- Sergelo, 13- Çalawe, 14- Cinarnî, 15- Nûlçeka, 16- Awejî, 17- Sîrwan 18- Kanîtor.

Ji mintiqâ Şarezor 22 gund, nahiya Qeredax û Derbendîxan.

Polit Buroya PDK-I di beyana xwe ya 19'ê Adarê de her wiha da xuyakirin ku "ji sala 1976 heta 1978 hukumetê bi erişen xwe 250 hezar Kurd mecbûr kir ku dev ji welatê xwe berde û koşî başûrê Iraqê bikin. Her wiha ji nîv milyoni zedetir xelk ji li herêmên rizgarkiri ciavidiye û di kampan de hatine bicîhkirin.

PDK-I û CUD di beyanên xwe de bangî Yekitiya Netewan, Xaça Sor, Komela Mafen Însanî û hemû hêz û komelên pêşverû û dostêن gelê Kurd dîkin, ku piştigirî û alîkariya xwe bi gelê Kurd re bilind bikin, dengê xwe li hember reji-ma diktatoriya Seddam bilind kin.

Roya 11'ê Gulanê van pisporê han qenatên xwe li ser politika

Destpêk r.1

Juriya Navnetewî Tirkîyê Rûres kir

ku ji kesen bi nav û deng, hin pirs ji teblîxvanan kirin. Di dawiya Konferansê de jûriyê qenat û biryara xwe eşkere kir. Juriya navnetewî ji kesen jêrin hatibû avakirin.

* Michalî Karalambidis, endamê Komita (liga) Giştî ya ji bo Maf û Rizgariya Gelan; nûnerê Dewleta Yunanistan di Komita Mafen Mirovayî de li Netewên Yekbûyî.

* Prof. Theodor Weiter, Feldhîrsch: endamê Komita Amnesty International; Wekilê Serokê Rêxistina Navnetewî ji bo Parastina Ziman û Kulturên Bindest;

Serokê Komita Ilmî û Pisporê Hiqûqi ya Rêxistina Karûbarêne Pirşirêkîn Dinê yê Penaberan (Association for the Study of the World Refugee Problem) û endamê Komita Giştî ya Navnetewî ji bo Mafen Însanî li Newyorkê (International League for Human Rights)

* Prof. Alaîn Fenet, Meriel (Fransa) Sekreterê Giştî yê Korra (grûba) Mafen Eqalîyetan (Goupiement pour les droits des minorites)

* Benjamin Whâtaker (Londra) Ji sala 1971'ê bi vir de di Netewên Yekbûyî de li Komisyonâra ji bo Parastina Eqalîyetan (miliyeten) û Mafen Mirovayî de nûnerê Ingîtere.

* Tilman Zulch -Göttingen Serokê Komela ji bo Gelên Bindest, Şewirmendê Buroya Ewrûpa ji bo zimanên kêm bikarhati (European Bureau for Lesser used Lenguges) û berpirsyarê kovara "Pogrom".

Roya 11'ê Gulanê van pisporê han qenatên xwe li ser politika

Tirkîyê ya li hember miliyet û netewan ji rojnamevanan re ji Konferansa Ewrûpa ji bo Ewleyî û Hevkariyê re û ji Netewên Yekbûyî re eşkere kirin.

Juri yeko yeko li ser neheqîya li ser miliyet û netewan sekini, derheqê Kurdan de da xuyakirin ku;

* Li Kurdistanâ Tirkîyê ziman û kultura Kurdi bindest e, bikaranîna Kurdi di nav gel de, di dibistan û daîren resmî de, çapkirina pir-tükên Kurdi, weşan û rojnamên Kurdi wek sückî tê ditin û taqbatê dibine.

* Bê hejmar Kurdên ku mafen xwe dixwazin, di hepsan de ne, işkencê û cezayî idamî dibînin. * Avakirina komelên aştixwaz, ên çandi û civakî qedexe ne.

* Bê hejmar gundi, bi zor ji ser erd û ava xwe têr rakirin û sur-gûnkin.

* Leşkerên Tirk êrişê dibin ser gundan Kurdish, keç û jinê Kurdish ixfal dikin, gundiyan birfîdar kirin û dikujin.

Li ser gelên din ji jurî bi kurti tiştên jêrin da xuyakirin:

Juriyê di derheqê Ermenî, Suryanî, Yunanî, Çerkez, Gurcî û Lazan de politika Tirkîyê mahkûm kir. Ev gelana ji dîrokek dûr û direj de tadeyî û zilmek pirr dijwar ji bal Tirkan ve dibîni û ev neheqî hîn ji li ser wan dom dike.

* Dêr û avayıyan van gelan têr imhakirin.

* Dewleta Tirk hê ji zilm û gel-qirkirina (jenosida) li ser van gelan -wek fermana fila-înkâr dike.

* Peymanê navnetewî ku Tirkîyê qebûl kiriye û wê mesûl dikin (girêdidin) nayê nasîn. Zilm li ser

van gelan wilo zêde bûye ku dev ji ciyê xwe berdidin roj bi roj hejmara wan kêm dibe.

Bi vê politikayê û van karûbarê xwe, Tirkîyê li hemberi peymanen jîrîn derdikeve ku wê bi xwe jî imzikeriye.

* Daxuyaniya Giştî ya Mafen Mirovayî ya Netewên Yekbûyî ku di 10.12.1948'a de hat imzekerin.

* Daxuyaniya Ewrûpa ji bo Mafen Azadi û Mirovayî (wek maddîn 2, 3, 8 û 9):

* Konferansa Helsinki

Ji ber van sedeman juriyê bi tevayı got, divê Tirkîyê nebe endamê Civaka Ewrûpa û ji Parlamentoya Ewrûpa bê derxistin. Heya ku Tirkîyê peymanen ku wê ji imzê kirine bîne cih.

Pisporê ku li ser "Politika Tirkîyê ya Netewan" teblîx dabûn. "Yekitiya Gelên Asya Piçûk" avakirin. Yekitiya Gelên Asya Piçûk sala were di İlône de wê li Atina-yê konferansekê bicivîne û politika Tirkîyê ya li hember gelan taqîb bike. Endamên juriyê jî di xwiyakirin ku wê piştigiriya xebata "Yekitiya Gelên Asya Piçûk" bikin.

Not :

(Di nîvisara "Destpêk" jiyanâ rojnamegerî li Kurdistân" de (hej.71) me nîvisi bû ku Musil piştî sala 1880'yi bû wilayet. Rastiya wê: Musil sala 1879'a bû wilayet. Bibexşîn. - M.Eli)

gêtren vedide û Xecê distîne.

Mirina Siyabend di dawiya destanê de, ew ji qeder e. Çima Siyabend bi qederê bawer naake û bi destê qederê dimre. Pêna ku pêwendiyen derebegi nû ber bi pücbûnê dicün, dirizîn, Şewîbûna Siyabend, nav-nasina destanê bi du kesan "Siyabend û Xecê" şana bûna maldariyê ye. Derebegi hat û ol bi xwe re anî. Maka felsefa olperestiyê derebegi ye. Maldarıji pê re gîhiş, li dijî felsefa derebegi rabû, ser lingên xwe li ber xwe da. Berxwedana Siyabend li dijî qederê şûna vê yekê ye. Destana "Siyabend û Xecê" ya wê demê ye gava ku maldarıji serî deda û şîn dihat û derebegi berew kifibûnê dicûn, aango ya dema ji derebegiyê derbas-bûna bo maldariyê ye.

Siyabend, baweriya xwe bi konê felekê nedanî. Guman û sewda wi -weki Hemletê Şekispîr- ku konê felekê heye an na. İca ji ber meraqa ku xwe bigihîne konê felekê guman û sewda ji serê wî derdi-kevin. Qereğetran(qeder) ji wî re dibêje felek heye. Ew dibêje na, nîne. Ka raberî min bike!

TEBİNİ:

(* E'lî Ebû Zira', Nîfirênen me li pey we hene, hey darêni bi'vî, Siyamend û Xec, belavokên Dar el-Kütâb el-Erebî, 1986, Sûriyê.

(**) Hiwanîs Şîraz, Çiroke-ke Evînî, Şanogerîya Siyamend û Xec, Zare, iergerandina Nîzar Xelîlî, belavokên Dar Sivan, Beyrût.

(1)- Hatî: mîrat, wereset.

(2)- Nîcmîrî: Jar, lawaz, sist.

(3)- Gumreh: Şen, (4)- Navser: Navdar, (5)- Teve: Digel, bi ser ve, (6)- Avsûn: Malkeke, ji ciqli û pejîn daran e, çîrvan wê malkê çedîke ku xwe têde veşere da ku nêçür wî nebîne, (7)- Talde: Sitare, (8)- Pê: Gav, dem, çax, (9)- Bi xwe distrê û bi xwe tew dike: Bi xwe ji xwe re lêtîne û mar dike, (10)- Çavik: Jêder, serçav, (11)- Zînhar: Yekcar, hîç, kok, (12)- Kok: Zînhar, (13)- Şenî: Xelk, mirov, (14)- Derdide: Zîrâr dike, dixisire, (15)- Vediye: Bi serdiikeve, kar dike, (16)- Xue li bêka wî digre: Li ser şopa wî dike, (17)- Nîhad: Wujdan, demîr, (18)- Sindî: Qeyd, (19)- Tol: Heyf, (20)- Ton: Reng, awa, (21)- Zîhîr: jehr.

li Kurdistana bakur ji begêne me re peyda nebûn heta ku Ermeniyan biçewşinîn û ji Ermenîstanê derfîn. Ên ku Ermenî چewsandine, maldarên Tirkên zordar bûn. Ew gunehkar in, ne begekî Kurd. A rast ji H. Şîraz re pena ku destanê biguhûre berê bavê Xecê bikira Tirkîkî beg, ne Kurdeki beg. Kurden beg ên dûvîçik-gotîne naxwaze- ji bo begitîya xwe geleksî pîsî kin. Em yekê dibêjin û yekê nabêjin, ku çeyiyê beg û xaneda-nen Kurd ên ku doza serbestiya gel û welêt kirine helbet em navêjin piştî gûhîn xwe. Kurda tu cari meramên xwe nebûn ku ji axa Ermenîstanê bibrin û bi ser Kurdistanê ve xînin. Meramên birrîn û zepkirin yê hikûmetên Tirk bûn. Hîva Ermeniyan -ne wekî H. Şîraz xwestîye bêjê- kete bin ewrên begekî Kurd, lê kete bin ewrên rejîmîn Tirk.

Siyabend, "sivan Ermenî" dibêje: "Kengî wê BIYANî koça xwe ji Çiyayê Sîpanê bar bikin?" Gelo ên biyanê kî ne, Kurd in an Tirk in? Em bibêjin H. Şîraz xwestîye hewil de ku bibêje en biyanî Tirk in. Baş e. Ji ser pirtûka H. Şîraz ta dawiyê zînhar şora "Tirk" têde nine. Bê guman ên "biyanî" Kurd in. Çinkî bavê Xecê

Hevpeyvînek bi Mueyed Teyîb re

Mueyed Teyib sala 1957'a li bajarê Dihokê ji dayîk bûye. Zaroktiya wî li vî bajarî derbas dibe û xwendina xwe ya destpêkê, navincî û amadeyî jî her li wir bi dawî tîne. Sala 1978'a li Bexdayê dest bi xwendina hiqûqê dike, lê ji ber rewşa siyasî û terora Beesiyan neçar dibe û sala dawiyê dest ji xwendinê berdide. Sala 1982'a tê nav rîzên şoreşê. Ji sala 1983'ya û vir de li Swêdê dijî û niha mamostatiya zimanê Kurdî dike.

Mueyed Teyip sala 1978'a bûye endamê "Yekîtiya Nivîskarê Kurd" li Îraqê û her wê salê di rojnama "Hawkarî" beşê Kurmancî de dibe redaktorê rûpelê "Edeb û Jiyan"- Rojnama Hawkarî sala 1970'ê bi du diyalektan(Soranî û Kurmancî) û bi tîpê Erebî dest bi weşanê kiriye û heta niha jî derdiçe. Rojnameyek heftane ye. -Dîsan ji sala 1978'a û pê ve programeke heftane bi navê "Her Stranekê Çirokek Heye" bo

— Kak Mueyed, me divê em ji Yekîtiya Nivîskarêne Kurd destpêbikin. Me gelek navê vê yekîtiyê bihistiye. Tu dikari ji me re piçekî çeli vê yekîtiyê û rola wê bikî?

M. TEYIB: Yekîtiya Nivîskarêne Kurd li sala 1969'ê bi armanca yekgirtina nivîskarêne Kurd û geşkîna tevgera edebî hatîye damezirandin. Piştî serketina 11'ê Adara 1970'ê rola wê xurttir lê hat. Piraniya nivîskar û şairên Kurd li dor yekîtiyê civîyan ku hingê nivîskarê hêja, şehîd Salih Yûsîvi serokê yekîtiyê bû. Wê demê merkeza wê li Bexdayê bû û li bajarê Silêmanî, Kerkük, Hewler û Dihokê çar leqên wê hebûn. Li sala 1974'ê; piştî despêkirina şerî, Yekîtiya Nivîskarêne Kurd bîrîra piştgirtina gelê xwe stand û piraniya nivîskaran cûn nav rîzên şoreşê û dest avêtin çekî. Ji 1975'ê heta 1976'ê, ji ber şikestina şoreşê kar û barêne Yekîtiyê rawestiya. Lê her disa wê salê kongra xwe ya pêncemîn girêda û careka din dest bi xebatê kir. Hikûmeta Îraqê wek hemû rîxistinê pîşeyî ên legal pêkol dîkir ku Yekîtiya Nivîskarêne Kurd jî bike zirneyek ji bo propaganda xwe. Lê hemî mihawelêne wê li ber avê cûn û Yekîtiya Nivîskarêne Kurd her ma dengê gele xwe. Ji ber vê çendê, Yekîtiya Nivîskarêne Kurd hurmet û viyanek mezin li cem mîletê Kurd û li cem hêzén şoresger ên Kurdistani û Îraqî hebû... Yekîtiya Nivîskarêne Kurd bi navê "Nûserî Kurd" kovareke mehane û hêja derdixist ku piraniya nivîskar û şairên Kurd berhemên xwe di vê kovarê de belav dikirin. Dîsan Yekîtiyê du festivalen mezin yê helbesta Kurdî amade kirine.

- Tu ji besdarî van festivalan bâyi?

- Min li sala 1975'ê dest bi nivîsi na şerî kiriye. Festivala pêşin sala 1970'ê li Kerkükê amade bûbû, lewra ez besdarî wê festivalê nebûm. Lê festivala duyemîn sala 1979'ê li Silemîyi bû ku ez ji besdar bûm... Helbet dîvê be gotin ku Yekîtiya Nivîskarêne Kurd, gelek kor û semîner jî li ser edeba Kurdî amade kirine.

- Kak Mueyed, hinek helbesten te di kovara "Berbang"ê de jî belav bûn. Weku em dizanin, tu helbesta serbest dinivisi. Tu dikari ji me re bibejî; çiye helbesta serbest?

- Helbesta Kurdî ji aliye form û naverokê ve di sê qonaxên girîng re derbas bûye. Qonaxa pêşin, qonaxa klasik e. Divê qonaxê de helbest ji aliye formê ve li ser erûza (wezn) Erebî diçû û naveroka wê jî ji bili -Babe Tahir Hemeda-nî û Ehmedê Xanî- bêtir li ser tese-wifê bû ku Melayê Cizîri yet ji niwîneren vê qonaxê ye:

Qonaxa duyemîn bi ser wezna hece (kit) diçû. Wezna heca ew e ku hejmara kitän di hemî rîzên helbestê de teme(wek) hev bin. Helbet di vê qonaxê de naveroka helbestê firehtir lê hat û meselên civakî bûne babetên helbestê. Ehmedê Nalbend yet ji şairên vê qonaxê ye:

**Ah fîxan evroke ne
Emrê me borî b'tesh
qela
Êş û elem piška me ne
Daîm bi eşqê mub
tela.**

Qonaxa siyemîn bi navê "helbesta serbest" tê nasîn. Di vê qonaxê de ji aliye form û naverokê ve gûhûnêk bingehîn kete şeera Kurdî. Bê guman pêşewayê vê qonaxê Goran e...

**- Baş e, Qedrî Can ku em
dizanin...**

- Ji bo Qedrî Can ez gotina Goranî dubare dikim. Di hejmara 1'ê ya kovara Beyan de hevpeyvînek di gel Goran hebû. Di wê hevpey-

Li Dihokê zarokêne Kurda li ber dîwara rûdinin û pêlavaya boyax dîkin. Kurê şehîdekî rûniştiye û cendirmeyek tê ku pêlava xwe boyax bike.

**Ne kurê min ne
Nekey... Nekey
Firçê xo j'axê rankey
Ew postala d'koşa te de
Mejyê babê te ye pê ve
Boyax nekey.**

vîn de Goran dibêje, Qedrî Can berî min dest bi nivîsina helbesta serbest kiriye.

**- Baş e, çîma Goran dibe pêş
wayê vê qonaxê?**

- Çînki ew guherînê me gotin bi awayek fireh û xuyatir di şeera Goran de ekere ne.

**- Baş e, ji aliye wezin ve qona
xa siyemîn ci guherîn xistiye
şeera Kurdî?**

- Di şeera Kurdî ya wezna heca de, hijmara heca di her rîzekê de teme hev bûn. Lê di helbesta serbest de bingehêk din jê re tê xuya kirin. Ev bingehê dibe sê kît bin, yan çar, yan pênc, yan şes û her weha... Û helbest li ser yek ji van bingehan ava dibe. Her rîzekâ wê li gor hijmara van kîta kêm û zêde dîbin. Ger bingehê çar kît bin, her rîzekâ wê çarçare kêm û zêde dîbin. Guhê xw bide wan ristên Goranî:

Payîz... Payîz.

**Min mat, tu zîz
Her du hawderd**

**Min firmeskim tu
baranit**

**Min henasem tu bay
sardit
Min xem tu hewrî gir
yanit
Dwayî naye dadim
dadit
Hergîz... Hergîz.
Payîz.... Payîz.**

— Gelo em dikarin bibêjin helbesta serbest a Kurdi bi wezin e, ne ku wek tê zanîn hemâ ji binî bê wezin e.

- Belê bi wezin e. Lê wezina wê dinamiktir e. Û qafîye wek qonaxê din ne meseleyek girîng e, lê disa bi awayek serbestir têde heye.

- Te got ji aliye naverok û formê ve guherîn çêbûn. Di qonaxa siyemîn de ji aliye naverokê ve ci guherîn kete şeera Kurdî?

- Di vê qonaxê de mesela netewî firehtir bû û bo cara yekê bi awayek ekere û fireh mesela çinatî kete nav helbesta Kurdî.

- Kak Mueyed, ev pirsyara dawiyê ye. Tu ciyê helbeste di edebiyata Kurdî de çawa dibînî û peywendiya wê bi doza

maweyê 3 salan li radyoya Kurdî li Bexda pêşkêş dikir. M. Teyib sala 1975'a dest bi nivîsina helbesta kiriye. Gelek helbest û nivîsarên wî di rojname û kovarê Kurdî de belav bûne. Wek; Hawkarî, Beyan, Peyv, Nûserî Kurd, Roşenbirî Nwê. Hinek helbesten wî hatine wergerandin bo zimanê Erebî û di rojnamen "Îraq" û "El Seqafe-l Cedîde" de derketine. Beşdarî piraniya festival û semîneren helbesta Kurdî bûye. Herweha gelek helbesten wî bûne stran û ji aliyê Tîpa Dihokê û Tehsîn Taha ve hatine pêşkêşkirin.

Li Stockholmê em pê re rûniştin û li ser rewş û problema nivîskarêne Kurdistana Îraqê û li ser helbesta Kurdî hevpeyvînek kir. Me pirsî wî bersivand:



Mueyed Teyib

Kurdistanê re çawa bûye?

- Di edebiyata nivîski ya hemû gelan de helbest ji giş cûrên din ên edebiyate kevintir e û bêtir di nav xelkê de ciyê xwe girtiye. Ev hoyek e ku helbest zâtür diçê nav xelkê. Her weha helbest di destpêka xwe de bi bîr û baweriyên

pîroz yê xelkî ve -ku diyanet bû-

girîdayî bûye. Ev ji hoyek e ku xelk bi çavekî pîroz li helbeste binêre. Helbesta Kurdi jî her ev sexlete(sifet) hene, anku ji cûrên din kevintir e û her di destpêka

xwe de bi İslâmî ve girîdayî bûye ku dînê xelkê me ye. Lê helbesta

- Pir sipas.

- Sipas.

Xortekî Kurd li girtîxanê li oda îdamê ye û wê sibe li sêdarê bidin. Vêca gazî diya xwe dike.

SIBE... NEKE GIRÎ DAYÊ

**Sibe dayê
Hêsta tarî
Berî roj bête vî warî
Berî hêlin vala bibin
Berî pale hişyar bibin
Min û sêdarê jivan e.**

* * *

Sibê dayê

Kevr û teraş û befr û xwîn

Ew dîlbera min a torîn

Dê dest d'stoyê min werînit

Dê firîn çîne asmana

Hemî ciya

Hemî derya

Gazî me kin

Dê hêne xar

Roj û bihar

Tavyeka barana pîroz

Bo çend mîrgêt napalma

Kirine qêr, hêlayîn beyar

* * *

Sibê dayê

Pêlava min j'taca mîrî bilintir e

Daweta min j'hemî govenda xweşîr e

Bejn û bala min j'bîharê b'xemiltir e

Evca çawa dê key girî

Singê xo yê teme derya

Dê vequfî

Pirça xo ya wekî befrê

Dê veçirî

Dergehê kolkê me yê xweş

Bo xem û nîhara vekey

* * *

Sibe dayê

Xanî dê serkê zavayî bo min bêjît û tu vegêre

Sibe dayê... Neke girî

Hemî zeryêt gundê me dê hêne wêre

Ger du rûndik jî bê destî

Ji her du çavêt te ketin

Tu b'xudê key zû veşêre

Da yara min nebêjîtin:

"Lawê min mir

Ev tifenga di destâ da

Mizgînî d'lûlyê ra jenî

Dîsa li koçka sultânî

Dê bîte exsîr û benî"

Evca rabbit

Ew kirâsê

J'serêt kopa

J'davêt rojê

Min bo ïnay

D'sevê vedet

B'kete tenî..

Ne dayê ne

Ne yarê ne.

**Lew seher cewlan didit, bayê sebayê rast û çep
Sosin û sunbil bi mestî bêñ semayê rast û çep
Da ji mîhraba du nûnan secede bit Eswedhecer
Dil bi mîzan, mahî new, ebrû nûmayî rast û çep.)**